BasNûçe
HERDEM RASTÎ
Rojname ya heftane ya nûçeyî - 2.5 TL
Hejmar: 65 10 - 16 Tebax 2015 basnews.com

www.arsivakurd.org

**Xizan Şîlan:**
## Eşqa min sira sewdayake nependî ye



R16

# Hewlêr ber bi aramiyê ve



Li Rêveberiya Herêma Kurdisatnê ku bi şerê DAIŞ'ê, krîza aborî û hin meseleyên navxweyî re mijûl dibe, partiyên siyasî li serhilbijartina serokatiya herêmê li hev kirin û çavlirê ye ku pirsgirêkên heyî ber bi çareserbûnê ve herin. Di navbera partiyên siyasî yên li parlemenê de pirsgirêk hat çareserkirin û li gor wê dema maweya Barzanî bo du salan tê dirêjkirin.

Wek tê zanîn partiyên wek YNK, Gorran û Yekgirtû ku di bin angajmana Îranê de ne heta demeke nêz nedixwestin ku Barzanî bo dewreke din bibe serokê RHK'ê. Piştî ku piştras bu da ku bêyî Barzanî çareseriya pirsgirêkên mezin ên heyî û yekgirtina siyasî ne pêkan e her sê partî li hev rûniştin û bi şertê ku hilbijartina serokatiyê li parlamenê pêk were lihevkirin. R02 - 03

## Rojava an qada şer?

Wek tê zanîn pêkanînên ku DAIŞ li Iraq û Sûriyê reşandin gihîşt asteke wisa ku meriv dikare bêje serdemek guhert û serdemeke nû da destpêkirin. Herwiha li Rojhilata navîn ew rastî ba saya DAIŞ'ê qewimî lê belê li Rojava û li sengerên RHK'ê derbeyên giran li DAIŞ'ê ketin û tenê li dewerên kurdan guherînên ku li Rojhilata Navîn qewimîn pêk nehatin. Şerkirin û rawestîna kurdan a li hember DAIŞ'ê jî bi xwe re ew yek anî ku kurd li ser maseya dîplomasiya cîhanê li kursiyê sereke rûnin. R04-5

## "Îranê çi dike?"



Serokkomarê Îranê Hesenê Rûhanî serdana Parêzgeha Kurdistanê kir û di çerçoveya mafên civakî de gelek qewl dan xelkê kurd. Dr. Kaan Dilek li ser rûdanên dawî yên li Îranê rawestiya û qewlên Hesen Rûhanî yên li Parêzgeha Kurdistanê ji BasNûçeyê re eşkere kir û daxuyand ku Îran dixwaze bide xuyakirin ku wê li hember kurdan proseya demokrasiyê daye destpêkirin û ew mafê kurdan dide wan. R08-9

## OHAL ji nû ve di rojevê de ye!

R12

## 'Çekan rawestînin zarokên me nekujin'

R13

**Şengal** — Birîna bê derman du salî ye R14
**Kırmanckî** — Hîkaye ya nûjen! R06-7
**Welat** — Dîlok R10-11
**Gabar Çiyan** — Du kes û yek mirov R15



Hewlêr:

# Siyaset ber bi aramiyê ve!

Li Rêveberiya Herêma Kurdistanê (RHK) ev demek dirêj e ji ber ku YNK, Goran û Yekgirtû polîtîkayên rikber ên li ser berdewamiya postê serokatiya Mesûd Barzanî ku bi angajmana Îranê dimeşandin pirsgirêkên siyasî hatibûn asta xeteriyê. RHK ku ji aliyekî ve li dij DAIŞ'ê şer dike û ji aliyê din ve li dij qeyrana aborî têdikoşe, ji ber israra van polîtîkayên rikbber ên van partiyan di warê siyaseta navxweyî de pir asteng bûbû. Ev partiyên şayanî gotinê ji bo serokê herêmê ji alî parlamenê ve bê hilbijartin zextên siyasî dmeşandin. Ji ber ku PDK jî ji daxwaza 'wê serokê herêmê ji alî gel ve bê hilbijartin' nedihate xwarê qeyrana siyasî hin mezintir bûbû. Piştî ku ev partî têgihîştin ku bi vê rikberiyê wê piştgiriya xwe ya ji gel wunda bikin paşve gav avêtin û bi 2 salên din berdewamiya postê serokatiya herêmê ya Barzanî razî bûn. Ger ku pêvajo bi vî awayî berdewam bibe tê çaverêkirin ku ev aramiya siyasî wê astengiyên li pêş kêşeyên wek; Qeyrana aborî, serxwebûn û tekoşîna li dij DAIŞ'ê jî bi hêsanî çareser bike.

Piştî nermbûna rikberiya tûnd a YNK û Goran, pisporên siyasî diyar dikin ku wê Mesûd Barzanî'yê ku hêzên mezin ên herêmê û yên dinyayê hêviya xwe pê ve girê dane dikaribe 2 salên din jî erka serokatiyê berdewam bike.

Îran'a ku ji rola Serokê RHK'ê Mesûd Barzanî'yê ku di şerê mezin ê li dij DAIŞ'ê de hêzeke mezin a manewî dide Pêşmerge haydar bûye, heftya çûyî Cîgirê Sekreterê Giştî yê Lijneya Ewlehiyê ya Neteweyîi Ahmed Amîr şande Hewlêrê da ku ji Barzanî re ragihîne ku Îran piştevanê berdewamiya serokatiya wî ye. Piştî vê helwesta Îranê, YNK û Goran jî di derbarê mijarê de daxuyaniyên erênî dan û diyar kirin ku ew ê nebin asteng. Lê belê ev helwesta van partiyan ji bo aramiya siyasî baş xuya bike jî ji ber ku rastiya bandora hêzên derve ya li ser siyaseta herêma Kurdistanê tîne ber çavan cihê şermê ye.

Barzanî'yê ku ji bo nekeve nav nîqaşên rikber ên li ser hilbijartina Serokê Herêmê bi hestiyarî tevdigere, bi helwestên xwe yên şexsî hewl dide ku di çarçoveya berjewendiyên neteweyî de qeyrana aborî ya herêmê, xurtkirina çekdarî ya Pêşmerge, arastekirina rewşa diyalogê ya şerê di navbera dewleta Tirk û PKK'ê û lêgerîna yekîtiya neteweyî ya li Rojava jî çareser bike. Di vê çaçoveyê de, Serokê RHK'ê Mesûd Barzanî, ji bo 13 şervanên YPG-YPJ'ê yên bakurî ku li Rojava di şerê li dij DAIŞ'ê de jiyana xwe ji dest dabûn û Tirkiyeyê cenazeyên wan li Deriyê Îbrahîm Xelîl dabû rawestandin jî kete dewrê û Tirkiye destûr da ku cenaze di deriyê sînor de derbas bibin û li warên wan bêne binaxkirin.

Her wiha Barzanî bi Lijneya HDP'ê ya di bin Serokatiya Parlamentê HDP'ê Osman Baydemîr ku ji bo lêkolînkirina êrîşa hewayî ya li dij gundê Zergelê ku bûbû sedema kuştina 8 hemwelatî , birîndarbûna bi dehan hemwelatî û ziyaneke mezin a aborî re hevdîtinekê pêk anî. Barzanî di hevdîtinê de ji lijneyê, di derbarê lêkolînên wan û rewşa şer a ku di navbera dewleta tirk û PKK'ê de ji nû ve rû daye de agahiyan stend.

### Ji nû ve agirbest?

Piştî ku Tirkiyeyê balefirgehên xwe yên Încirlîk û yên Bakurê Kurdistanê ji bo li dij DAIŞ'ê bêne bikaranîn ji DYA û hevpeymanên wê re vekir û bi vê biryarê re li dij kamp û baregehên PKK'ê dest bi êrîşên hewayî kir, hêzên herêmê û dinyayê jî helwestiyan. Piştî ku wek raya giştî ya Amerîkayê Serokê DYA Barack Obama jî di derbarê vê helwesta Tirkiyeyê de nerazîbûna xwe anî ziman û got: "Li gel mîsogeriya mafê xweparastinê jî, divê Tirkiye enerjiya xwe ya ku li dij PKK'ê xerc dike, li dij DAIŞ'ê xerc bike." û pêşniyaza RHK'ê ya; 'Divê her dû alî pirsgirêkê bi diyalogê çareser bikin.' her çiqas nîşaneyên agirbestê derxin holê jî, ji bo alî tiliyên xwe ji tetikan bikêşînin tu nîşane tune ne û ev yek Tirkiyeyê di qada navneteweyî de dixe tengasiyê.

### Alî nêzîkî hev dibin

Di derbarê maweya postê serokatiya Serokê RHK'ê Mesûd Barzanî de agahiyên ne zelal belav dibin. Li Başûrê Kurdistanê, ji aliyekî ve angaştên ku YNK û Goran li ser 2 salên din jî berdewamiya postê serokatiya Mesûd Barzanî, bi şerta ku hilbijartina serok ji alî parlamenê ve bê kirin, razî bûne belav dibin, ji aliyê din ve jî Berdevkê Polîtburoya YNK Îmad Ahmed daxuyaniyeke berovajî da. Ahmed, di derbarê mijarê de daxuyand ku tu beyanateke YNK'ê ku berdewamiya postê serokatiya Barzanî pesend kirî ye tune ye û aşkere kir ku YNK, pergala parlamenî ku serokê herêmê ji alî parlamenê ve tê hilbijartin û rayeya wî ji alî parlamenê ve tê sînorkirin diparêze.

Di derbarê mijjarê de Berdevkê Partiya Yekîtiya Îslamî(Yekgirtû) Ebûbekir Karwan ji BasNûçe'yê re ragihand ku ji bo çareseriya vê kêşeyê beriya niha 3 civînên piralî hatine lidarxistin, ji van civînan tu encamek nehatiye bidestxistin, lê belê niha hewldaneke nû heye, ji bo çareseriya kêşeyê ji bilî PDK'ê partiyên din di nav xwe de hevdîtinan pêk anîne, piştî hevdîtinan partiyan nameyeke ku tê de pêşniyaza, 'Bi şerta ku serokê herêmê ji alî parlamenê ve bê hilbijartin ew razî ne ku Birêz Mesûd Barzanî 2 salên din jî postê serokatiyê berdewam bike.' ji PDK'ê re şandine, egerî heye ku ev pêşniyaz ji alî PDK'ê ve jî bê pesendkirin lê belê ji bo encamên vê diyalogê mîsoger bibe pêwîst e çend rojên din jî çavlirê bin.

### 'Ji ber mezintirîn partî ye erka PDK'ê mezin e'

Berdevkê Yekgirtû Ebûbekir Karwan destnîşan kir ku ji ber mezintirîn partiya Başûrê Kurdistanê ye erk û mesûliyeta PDK'ê jî pir mezin e û ji ber vê yekê jî divê rê û rêbazên din ên çareseriyê bêne niqaşkirin. Karwan, anî ziman ku hêviyên partiyên din ji PDK'ê hene û angaşt ku PDK rola xwe bileyize ew ê dikaribin vê kêşeyê çareser bikin û çareseriya vê kêşeyê wê xebatên destûra nû jî hêsantir bike. Karwan di derbarê xebatên nivîsandina destûra nû de jî van agahiyan da:

"Nêzîkî 70 xalên destûra nû hatine nivîsîn, lê belê lijneya destûrê hîna negihîştiye mijara şêweya hilbijartina serokê herêmê. Ji ber vê yekê jî nîqaşên li ser vê mijarê ne di nav Lijneya Amadekar a Destûra Nû, li parlamenê û di raya giştî de têne kirin. Çareseriya kêşeya şêweya hilbijartina serokê herêmê bi PDK'ê ve girêdayî ye. Ger PDK vê pêşniyaza partiyên din erê bike wê kêşe çareser bibe û ev yek wê xebatên lijneya desturê jî hêsantir bike."

### Ahmed Gerdî: Divê vîna neteweyî esas be

Fermandarê Hêzên Pêşmerge yên Navendî Ahmed Gerdî jî ji BasNûçe'yê re ragihand ku Serokatiya RHK'ê û PDK dixwazin serokê herêmê ji alî gel ve bê hilbijartin, ev rêbaza herî demokratîk e, lê belê di raya giştî de tê belavkirin ku ev yek li dijî pergala parlamenî de ye û wiha dom kir: "Serok Barzanî û PDK bang kirin ku bila ev mijar di bin banê parlamenê de bê çareserkirin. Çawa vîna neteweyî ku dikaribû bi hevkariya hemû alî û pêkhateyên herêmê hikûmetê damezirîne, dikare vê kêşeyê jî çareser bike. Guherîna helwesta YNK, Goran û partiyên Îslamî di pratîkê de erênî xuya bikin jî, ji ber ku bi guherîna helwesta Îranê ve girêdayî ye, di warê vîna neteweyî de ne şayanî rûkeniyê ye. Em tev dizanin, piştî guherîna helwesta Îranê ya di derbarê vê mijarê de, helwesta van partiyan jî guherî ye û ev her tiştî aşkere dike."

### 'Îran Barzanî'yekî lawaz dixwaze'

Li ser pirsa me ya 'Çima piştî Îran'a ku bandora wê ya li ser YNK'ê û Goran tê zanîn, piştgirî da 2 salên din berdewamiya serokatiya Barzanî, ev partî jî ji vê yekê razî bûn?' Berdevkê Yekgirtû Ebûbekir Karwan got: "Ji destpêkê ve tu partiyên herêmê ne li dij berdewamiya postê serokatiya Birêz Mesûd Barzanî bûn. Kêşe ji helwesta PDK'ê ku li dijî pergala parlamanî ya tekûz ku serokê herêmê ji alî parlamenê ve bê hilbijartin der dibû. Ger ku PDK bi vê yekê razî bibûya wê ev kêşe rû nedabûya. Îran û Tirkiye ji bo aramiya herêmê, dixwazin ku Barzanî du salên din jî erka xwe ya serokatiyê berdewam bike. Lê belê Îran, ji bo berjewendiyên xwe yên siyasî dixwaze Barzaniyek lawaz serokatiyê bike."

Li ser helwesta partiyên Îslamî ya di derbarê xala 6. a destûrê ya ku pêwendiya destûrê û şerîet û olê destnîşan dike jî Karwan diyar kir ku PDK, YNK û heta radeyekê Tevgera Goran ragihandine ku ev mijar dikare bê nirxandin û got: "Ev helwesta erênî ya van partiyan pêşî li mezinbûna vê meseleyê girt. Li ser vê mijarê û gellek mijarên din nîqaşên sûdwer têne kirin. Ger ku kêşeya şêweyê hilbijartina serokê herêmê jî bê çareserkirin, wê astengiyên li pêşiya nivîsandina destûra nû jî ji holê rabin."

### Barzanî: Şengal berdewamiya qirkirina kurdan a dîrokî ye

Serokê RHK'ê Mesûd Barzanî di yekemîn salvegera qirkirina Şengalê de li Duhokê beşdarî merasîma bibîranî bû û di merasîmê de xîtabî gel û rayedarên rêveberiyê kir. Barzanî di axaftina xwe de sivîlên ku di êrîşan de hatine kuştin û Pêşmergeyên ku di parastina Şengalê de jiyana xwe ji dest dane bibîr anî. Barzanî qala xwe ya çûna Çiyayê Şengalê ya di kêliya berdewamiya şer de kir û wiha dom kir: "Rêyên Sunûne û Çiyayê Şengalê bi xwîna Pêşmergeyên qehreman hate vekirin. Wek em dizanin erdnîgariya Şengalê ji bo parastinê pir xeter e. Ji ber vê yekê li vê herêmê qetlîam çêbûne û di dîrokê de jî nimûneyên wiha gellek in. Lê belê niha ev erdnîgarî bi Herêma Kurdistanê ve hatiye grêdan û parastina wê baş tê kirin."

Barzanî di berdewamiya axaftina xwe de spasiya hêzên din ên Kurdistanî ku bi Pêşmerge re parastina Şengalê kirine û rê li ezdiyên ku di Çiyayê Şengalê de asê mane vekirine jî kir û bang li hemwelatiyên ezidî yên ku ji Şengalê reviyane kir: "Min ji Babê Şêx re jî got. Ji ber êş û azara vê karesatê ez derbeder bûm. Lê belê wê Ezdîxan tune nebe; Lewre tunebûna Ezdîxan tunebûna kurd e. Xweşk û birayên ezdî, ji xwe bawer bin. Ve axê wek welatê xwe bizanin û hêvî bikin ku em siberojeke bextewar biafirînin. Ev karesata ku li dij ezdiyan hatiye kirin, berdewamiya qirkirina kurdan a dîrokî ye. Qirkirina 12 hezar Feyli, 8 hezar Barzanî û 182 hezar qurbaniyên enfalê û îro jî ev qirkirina ku hatiye serê gelê me yê ezdî. Lê belê em di şerê meydanî de tola van qirkirinan distînin û ez soz didim we ku heta yek kujerek ezdiyan bimîne em ê ji tolhildanê venegerin."

Barzanî di dawiya axaftina xwe de da zanîn ku ji bo Şengal bibe parêzgeh ew ê bi Bexdayê re bikevin nav hewldanan û ji Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî daxwaz kir ku li gel qeyrana aborî ya mezin jî muameleyeke taybet ji bo Şengaliyan bike û kêşeyên wan çareser bike.

### Alimên îslamê Pêşmerge pîroz kirin

Berovajiyê Alimên Îslamê yên ku li dij DAIŞ'a ku li gel cudahiyên baweriyê, di çarçoveya mezheba ku ew jî endamên wê ne de jî tu cûdahiyekî qebûl nake û fermanên Qur'an'a pîroz li gor feraseta xwe ya selefîst a tûndrew û dirinde bikar tîne dengê xwe bilind nakin, hin Alimên Îslamê yên ku DAIŞ'ê û feraseta wê rûreş dikin û di şerê li dij wê de Pêşmerge pîroz dikin serdana Serokê RHK'ê Mesûd Barzanî kirin. Lijneya Alimên Îslamê ya ku ji Sekreterê Giştî yê Yekîtiya Alimên Îslamê yên Dinyayê Elî Qeredaxî, Serokê Lijneya Hereketa Îslamî ya Kurd Hisên Necmedîn Resûl, Serokê Zanîngeha Geşedana Mirovperwerî Dr. Merwan Ehmed Reşîd û hin endamên Hereketa Îslamî ya Kurd pêk dihat di serdanê de tekoşîna Pêşmerge pîroz nirxandin û dane zanîn ku ew bi niyazên xwe piştgirî didine Pêşmerge. Hate ragihandin ku lijneyê, li gel Serokê RHK'ê Mesûd Barzanî di derbarê karesata ku DAIŞ bûye sedem û tekoşîna meyldariyên bîrdozî yên Îslamiya tûndrew danûstendina ramanî kirine. Di vê serdana ku rîskên aramî, aborî û siyasî yên ku RHK'ê dijî jî hatine gotûbêjkirin de hate ragihandin ku li ser navê lijneyê, Sekreterê Giştî yê Yekîtiya Alimên Îslamê ya Dinyayê Elî Qeredaxî, ji ber pêşekiya tekoşîna li dij DAIŞ'ê dike Hêzên Pêşmerge pîroz kirî ye.

### Li Silêmaniye'yê li hember gendeliyê nerazibûn gur dibin

Ji ber angaşten gendeliyê di salên borî de gelek endamên YNK'ê jê veqetiyabûn û Tevgera Goran ava kiribûn. Di gel vê yekê jî amaje bi wê yekê tê kirin ku gendelî berdewam in. Lewre hefteya borî li gel Silêmaniyê li Helebce, Kifrî, Dokan, Xurmal, Germiyan û Derbendixanê jî gel derketin kolanan û nerazîbûn nîşan dan. Gelê derketin ser kolanan, xwepêşandan li dar xistin, xwestin ku rêvebirên ku tevlî gendeliyê dibin dest ji karê xwe berdin û rê li ber vî karî bigrin. Berpirsê PDK'ê yê Helebceyê Fazil Beşaretî ji BasNûçe'yê re axivî û da zanîn ku ew piştevaniya xwepêşandanan dike, lê belê divê xwepêşandan nebin sedema ji holê rabûna aramî û asayîşa herêmê. Her wiha Beşaretî, da zanîn ku mafê hemû hemwelatiyî heye ku li hember kêmasiyên rêvebiran xwepêşandanan bikin û hesab ji hikûmetê bipirsin. Beşaretî got: "Lê belê sedemê van xwepêşandanan ne hikûmet e, rêvebirên herêmî ne.

Ji alî din ve amaje bi wê yekê jî hat kirin ku rêvebirên YNK'ê ji herêmê reviyane. Piştî belavbûna van angaştan Endamê Meclîsa YNK'ê Bextiyar Şawes angaşt ku agahiyên revyana rêvebirên YNK'ê derew in û ragihand ku kêşeyên nedayîna mûçe û birîna elektrîkê li bajarên din jî hene. Şawês li ser polîtîkayên YNK'ê jî rawestiya û daxuyand ku gel dikare li ser zemîna siyasî ya ku YNK'ê pêkan kirî ye xwepêşandanan saz bike û bertekan nîşan bide.

### Ciwanên netewî bûn şampiyonên Norway Cup 2015

Di tûrnuwaya Futbolê ya Norway Cup 2015'an de şampiyoniya Tîma Fûtbolê ya Neteweyî ya Ciwanên Kurdistanê kurdan rûgeş kir. Piştî ku li Başûrê Kurdistanê rêveberiya Federal hate ragihandin û RHK'ê derfetên mezin ên azadiyê bidest xist, grîngiyeke mezin da werzîşê û di vê baryê de dest bi pêkanîna binemayeke mezin a werzîşê kir. Piştî çend serkeftinên werzîşî yên navneteweyî stendina vê Kûpa zêrîn a Norwêcê nîşaneya wê yekê ye ku wê bidestxistina serkeftinan her bidome. Tîma Fûtbolê ya Neteweyî ya Ciwanên Kurdistanê beriya vê salê jî 4 caran beşdarî Norway Cup'ê bûbû û sala çûyî heta fînalê hatibû lê di fînalê de têk çûbû û bi duyemîniyê razî bûbû. Di fînalê de Tîma neteweyî bû reqîbê Tîma Norwêcî ya Hormindallê. Herdû tîmên ku di xulekên maweya normal û yên maweya dirêjedemiyêde hev têk nebirin dest bi penaltiyan kirin. Di dawiya penaltiyan de Tîma Kurdistan bi ser ket û bû xwediyê Kûpa Zêrîn.

### Fermandarên eniyan bang li siyasiyan kirin: Kêşeyan çareser bikin

Di kêliya ku Rojnameya me li ber çapê bû agahiyeke grîng gihîşt ber destê me. 42 Fermandarên Pêşmerge ku li Başûrê Kurdistanê di eniyên li dij DAIŞ'ê de şer dimeşînin, ji Serokatiya RHK'ê Hikûmet, Parlaman, Wezareta Pêşmerge û hemû partî û pêkhateyan re name şandine û daxwaz ji wan kirine ku kêşeyên ku bûne sedemê qeyrana siyasî helbiwestin û van kêşeyan çareser bikin. Di nameyê de xeteriyên wek; Şerê li dij DAIŞ'ê qeyrana aborî û siyasî ku niha RHK'ê bi wan re rûbirû maye hatine destnîşankirin û erka siyasiyan a çareserkirina kêşeyan hatiye bibîrxistin. Fermandarên Pêşmerge di nameyê de vê hişyariyê kirine: "Di vê rewşa awarte de mafê siyasiyan tune ye ku kêşeyan mezintir bikin, berovajî erka wan a sereke ew e ku ji bo çareseriya kêşeyan dest bi diyalogên sûdwer bikin û herêmê ji qeyranan rizgar bikin. Di nameyê de her wiha rewşa heyî wek; 'Gelemşeya siyasî' hatine binavkirin û wiha hatiye gotin: "Li ser binemaya hurmetdariya Pêşmergeyên ku ji bo axa xwe bi canfîdane têdikoşin, di xala çareserkirina kêşande avêtina gavên diyalogê wê ji bo Pêşmerge jî bibe sedema moraleke mezin. Bi şahidiya hemû dinyayê, ji salekî bêtir e ku li ser erdnîgariyeke ji hezar kîlometirî dirêjtir; Ji Xaneqîn ta Celewla, ji Şengalê ta Zûmarê, ji sînorê Rojava heta Kobanê, keç û lawên gelê Kürdistanê ji bo axa xwe ya pîroz biparêzin, qehremanî û fedakariyeke bêhempa dikin. Pêşmergeyên ku di mercên herî dijwar de jî bêyî gazineke piçûk, li dij terorîstan 1200 şehîd dane û bi hezaran birîndar bûne, ji vê qeyrana siyasî ya ku di demeke wiha de rû daye û dikare ziyanên mezin bide gelê Kurdistanê siberoja herêmê peroşdar in. Gelê Kurdistanê û Pêşmerge wê bi her awayî piştgirî bide hewlên çareseriyê."

Hin Fermandarên Pêmerge ku vê nameyê îmze kirine ev in: Sekreterê Giştî yê PSDK'ê û Fermandarê Eniya Kerkûkêe Mihemed Hacî Mehmûd, Endamê Polîtburoya YNK'ê û Fermandarê Eniya Germiyanê Mehmûd Sengawî, Fermandarê Eniya Zûmarê Zaîm Elî, Wezîrê Pêşmerge yê Berê Şêx Cafer Şêx Mistefa, Cîgirê Wezîrê Pêşmerge Enwer Hecî Osman, Serfermandarê Hêzên Pêşmerge Cemal Emînkî, Fermandarê Hêzên Taybet ên Zêrevanî Ezîz Weysî, Fermandar Mihmed Xalid Boselî û Fermandarê Eniya Şengalê Qasim Şeşo.

### Baranî pêşwazî li kesûkarê qurbaniyên Zergelê kir

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî di hevdîtinekê ligel kesûkarê qurbaniyên gundê Zergelê de diyar kir ku şer malwêranî ye, ew li dijî şer in û nabe xelkê bê guneh bibin qurbaniyên şer û berberiyê. Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî îro li Selahadîn pêşwaziya kes'ukarê qurnabiyên gundê ergelê kir. Li gor daxuyaniya malpera fermî ya Serokatiya Herêmê, di hevdîtinê de Serokê Herêma Kurdistanê diyar kir ku qurbaniyên Zergelê 'şehîdên' hemû Kurdistanê ne, 'şehîdên' şerekî ne ku ew ne alîgirê wî şerî ne. Barzanî ragehand ku wan gelek hewl daye da ku careke din şer rû nede û got: "Jiber ku me dizanî şer û kuştin malwêranî ye. Em li dijî şer in û nabe xelkê guneh bibe qurbanê şer û berberiyê. Niha jî em hewl didin ku careke din şer raweste û vegerine aştiyê." Barzanî di berdewama axaftina xwe de hevxemiya xwe bo malbatên qurbaniyan derbirî û daxuyand ku ew pir baş êş û azarên wan têdigehe û wiha berdewam kir: "Hemû saman û servetê cîhanê nake dilopekê xwîna şehîdan ku bi neheqî xwîna wan hatiye rijandin. Lê belê dîsa jî her çi ji dest me tê, bo qerebûkirina ziyanên xelkê emê bikin. Her wiha me Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî rasipartiye ku her çi ji dest wan bê bikin û birîndaran zû çareser bikin." Kesûkarên qurbaniyan jî diyar kirin ku helwesta Barzanî barê xemên wan kêm dike û gotin ku wan gundên xwe piştî raperîna sala 91'ê avakiriye û xwestiye ku jiyanek wan ê asayî hebe û bi wê jiyana sade jî dilxweşbûne. Kesûkarên qurbaniyan gotin: "Lê mixabin di dirêjiya salên borî de me baca vî şerî daye û bi dehan qurbanî daye, herwiha jiyana me têkçûye û malên me dîsa wêran bûne. Beriya niha bi dehan car me daxwa ji PKK'ê kiriye ku baregahên xwe ji gundan dûr bixin da ku jiyana xelkê mednî nekeve metirsiyê. Lê belê guh nadin van daxwazên me lewma em nikarin ji jiyana xwe dilniya bin." Kesûkarên qurbaniyan dubare kirin ku heger ev şer ji wan dûr nebe, ew naçarin ku bo parastina jiyan û malbatên xwe ji xakên bavûkalên xwe derbikevin.

www.arsivakurd.org

www.arsivakurd.org

## Rojava:

# Azadî an meydana şer?

Mehmet Salih Batırhan

Wek tê zanîn pêkanînên ku DAIŞ li Iraq û Sûriyê reşandin gihîşt asteke wisa ku meriv dikare bêje serdemek guhert û serdemeke nû da destpêkirin. Herwiha li Rojhilata navîn ew rastî ba saya DAIŞ'ê qewimî lê belê li Rojava û li sengerên RHK'ê derbeyên giran li DAIŞ'ê ketin û tenê li dewerên kurdan guherînên ku li Rojhilata Navîn qewimîn pêk nehatin. Şerkirin û rawestîna kurdan a li hember DAIŞ'ê jî bi xwe re ew yek anî ku kurd li ser maseya dîplomasiya cîhanê li kursiyê sereke rûnin. Di vê qonaxê de geşedana balkêş jî helbet beşdariya Tirkiye'yê ya li gel hevpeymaniyê ye. Bi guherîna polîtîkayên Tirkiye'yê yên li hember DAIŞ'ê û munasebetên wê yê li gel DAIŞ'ê çi di eniya şer de çi li yên rû bi rû zemîna polîtîkayên Rojhilata Navîn jî guhert. Piştî tiffaqa Amerîka û Tirkiyê û bikaranîna Balafirxaneya Leşkerî ya Încîrlîkê ji hêla bereya hevpeymaniyê û guherîna polîtîkaya Tirkiyê da zanîn ku ewê geşedanên nû rû bidin. Di vir de tiştê ku balê dikşîne û tê gengeşîkirin helwesta kurdan a li hember DAIŞ'ê bû. Kurdan parastina hemû herêmê girtin serxwe. Bi taybetî jî şanazî û pîroziya li hêzên kurd ên li Rojava dihat kirin roj bi roj kêm dibin û rola wan êdî ne li ber çava ye. Bi beşdariya Tirkiye'yê xetereya li ser Rojava jî, 'herêma tampon' an herêma ewle ya Tirkiye'yê ye. Gengeşî pirsên li ser wê yekê tên kirin ku gelo dê herêma Rojava di nav tampona Tirkiye'yê de cih bigre an na?

Li gor zanyariyên di çapemeniyê de cih digrin ewê kurd beşdarî herêma tampon a Cerablusê nebin û Tirkiye ji hebûna kurdan neraziye. Li hêla din li gor tehlîlgerên siyasî Tirkiye amadekariya dagirkirina Rojava û Helebê dike û hewl dide ku vê yekê bi koalîsyonê bide qebûl kirin. Tehlîlekeyeke din jî ewe ku Tirkiye ji ber şerê li Bakurê Kurdistanê yê bi PKK'ê re naxwaze li Rojava bi PYD'ê re di heman sengerê de cih bigre. Ev jî pirsên weke, "Ewê êdî kî bi kê re şer bike?, Ew ê kî bi kê re di heman sengerê de be?" bi xwe re tîne. Weke ku tê zanîn niha bi dehan rêxistin li Rojava li gel hev şer dikin. Gelek komên bi ser Burkana Feradê ve demeke dirêje li gel YPG'ê şer dikin. Li hêla din hatibû zanîn ku hin komên bi ser vê rêxistinê ve teqîna Kobanê ya beriya bi demekê pêk anîbûn. Li hêla din bi beşdariya Tirkiye'yê ya koalîsyonê xetereya wê yekê heye ku Tirkiyê jî planên xwe bixe meriyetê. Li hêla din peywendiyên Esed û PYD'ê jî ji mêj ve ye dibin cihê şik û gumanan. Li gor rewşa heyî û polîtîkaya ber bi çav diyar e ku ewê kurd nikaribin destkeftiyên xwe biparêzin. Bi beşdariya Tirkiyê û avabûna herêma tampon eşkereye ku proseya têkbirina destkeftiyên kurdan a li Rojava li holê heye. Li gel xwebexşî û berxwedaneke mezin tiffaq pêk neanîne PYD'ê ya li gel Hikûmeta Herêma Kurdistanê û partiyên siyasî yên Rojava bûye sedem ku Rojava bibe rêya çûn û hatina şer û her tim şer li Rojava li dar be.

Her wiha dewleta Tirkiye ya ku hemû polîtîkaya xwe ya Sûriye li ser têkçûna Esed avakiribû bi vekirina Balafirxaneya Leşkerî ya Încîrlîkê ji koalîsyonê re dest bi guherîna planan kir û dest bi avakirina herêma tampon kir. Ev jî didin eşkere kirin ku rûdanên nû ew ê pêk werin. Ew xalên hanê û geşedanên ku bi taybetî jî bi bêhayiya kurdên Rojava destpêbûne dibin sedema fikarê da ku kurd wê karibin destkeftiyên xwe biparêzin an dê Rojava bibe sergoyekî şer!

Tirkiye beriya li gel hevpeymaniya Emerîka serkêşiya wê dikir tiffaqê durist bike bi hezaran leşker û teqemenî şandin sînorê Rojavayê Kurdistanê. Piştî duristbûna tifaqê jî Tirkiyê dest bi avakirina herêmeke tampon kir. Cihê herêma tampon a di navbera bajarên Efrîn û Kobanê de cih digre û daxuyaniya Serokkomarê Tirkiyê Recep Tayyip Erdoğan a "Bedêla wê çi jî be emê destûrê nedin li başûrê me dewleteke kurd ava bibe." Û rûdanên nû weke êrîşên li ser xelkê sivîl ên Bakurê Kurdistanê, bombardûmana gundiyên Herêma Kurdistanê her wiha êrîş û operasyonên ser PKK'ê didin zanîn ku Tirkiye li sê eniyan li hember kurdan di şer de ye.

Li hêla din medyaya Tirkiye ya ku ji pêşketina kurdan aciz bû û wê nerazîbûna xwe weke "PYD ji DAEŞ'ê xeternaktir e" ragihand, niha jî dide eşkere kirin ku Emarîka kurdan weke "hevpeyman" nabîne û kurd li Rojava dibin sedema koçberiya mirovan. Her çend medyaya Tirkiye behsa vê yekê jî bike Berdevkê Karê Derve yê Emerîka'yê Mark Toner li ser wan angaştan rawestiya û amaje bi wê yekê jî kir ku kurd di şerê li hember DAIŞ'ê de roleke sereke werdigrin. Her wiha Toner daxuyand ku beşdariya Tirkiye ya hevpeymaniyê nayê wê wateyê ku Emerîkayê bi kurdên Rojava re xayîntî kiriye û ewê Tirkiye êrîşî kurdên Rojava jî neke. Piştî daxuyaniya Toner hat zanîn ku antîpropaganda û reşkirina kurdan a di medya ya Tirkiye'yê de jî gelekî zêde bûye.

### Lî sînorê Rojava 'herêma leşkerî ya demkî'

Di vê navberê de li sînorê Rojavayê Kurdistanê li bajarê Rihayê li navçeya Akçekale'yê 3 herêm weke 'herêma leşkerî ya ewle' hatin ragihandin. Walîtiya Rihayê sê herêmên navçeya Akçekale'yê 'herêma leşkerî ya ewle' ragihand. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Ji bo parastina can û malên xelkê nêzîkî sînor û ji bo têkbirina talûkeya li ber sînor hin herêm ji bo 15 rojan weke herêmên taybet ê ewlekariyê hatin ragihandin." Hat zanîn ku biryar li gor Zagona Qedexeya Herêmên Leşkerî û bi hejmara 2565'an û bi xala 32/A'yê hatiye derxistin. Di daxuyaniyê de nav û cih û dema ragihandina herêman jî wiha hatiye eşkerekirin.: "Li sînorê Sûriyê li Yağmuralan-Tatlıca, Öncül-Arıcandere, Qereqola Esentepe û Qereqola Ziyaretê ji 6 Tebaxê heta 21'ê Tebaxê 'herêma leşkerî ya demkî' hatiye eşkerekirin.."

### "Tirkiye ne samîmî ye"

Hevseroka Meclîsa Zagonsaz a Kobanê Fewziya Evdo, li ser polîtîkayên Tirkiye rawestiya û ji BasNûçe'yê re axivî. Evdo amaje bi wê yekê kir ku Tirkiye bi hinceta şerê li hember DAIŞ'ê hemû kurd û Kurdistan ji xwe re kiriye armanc û kurdan armancên Tirkiye'yê û Serokkomarê wê Recep Tayyip Erdoğan vala derxistine. Di berdewamiya axaftina xwe de Evdo li ser 'herêmên ewlekariyê' yên Tirkiyê rawestiya û daxuyand ku Tirkiyê hewld dide ku çavên wan bitirsîne û gefan li wan bixwe. Her wiha Evdo ragihand ku hevpeymanî û Emerîka ji polîtkayên rêvebirên Rojavayê Kurdistanê piştrastin û ewê di pitşgiriya hêzên kurd de berdewam bin. Evdo, di berdewamiya axaftina xwe de bal kişand ser leşkerên Tirkiye'yê yên li ser sînorê Rojava'yê Kurdistanê jî û wiha berdewam kir: Tirkiye bi hinceta xetereya DAIŞ'ê sînorê Rojava tijê leşker kiriye. Çavê wan li wê yekê ye ku ewê me bitirsînin. Goya eşkere dikin ku li hember DAIŞ'ê şer dikin. Heta niha bi wan operasyonên xwe DAIŞ ji ku derxistin? Rêyên DAIŞ'ê girtine an na? Bila bersiva van pirsan bidin."

### 'Em bi koalîsyonê re hevpeyman in'

Di berdewamiya axaftina xwe de Evdo daxuyand ku Emerîka û hevpeymanî berxwedana YPG-YPJ'ê ya li hember komên radîkal ên îslamîst bilind dinirxînîn û angaştên ku rayederan Tirkiye dikin ne di cih denin. Evdo, amaje bi wê yekê jî kir ku hevpeymanî ji wan re teqez dike ku li Sûriye'yê hevpeymanên wan ên leşkerî û siyasî kurd in û ewê alîkariya wan a ji bo Rojavayê Kurdistanê berdewam bike. Evdo her wiha da zanîn ku tekane hêza li hember DAIŞ'ê şer dike û li parastina rûmeta mirovahiyê dike kurd in. Evdo, eşkere kir ku berxwedana kurdan ji hêla raya giştî ya cihanê ve jî hatiye dîtin û hemû cihanê piştgiriya wan kiriye. Evdo da zanîn ku eger bi hinceta DAIŞ'ê êrîş werin ser wan ew di amedebaşiyê de nin û ew ê bersiva wan êrîşan bidin.



### Gelo di êrîşên Efrînê de tiliya Tirkiyê heye?

Êrîşên El Nûsraya bi ser El Kaide'yê yên li Efrînê jî berdewam dikin. Rojnameger Mihemed Roj li ser êrîşên El Nûsra'yê û rûdanên dawî yên li herêmê rawestiya û ji BasNûçe'yê re axivî. Mihemed Roj bal kişand ser êrîşên El Nûsra'yê û eşkere kir ku êrîşên rêxistina navborî bi piştgiriya Tirkiye'yê pêk hatine û bi pêk hatina êrîşan re hêzên kurd dest bi parastina xelkê sivîll kirine û bersiva êrîşên El Nûsrayê dane. Di berdewamiya axaftina xwe de Roj bal kişand ser peywendiyên Tirkiye û rêxistinên îslamî û wiha berdewam kir: "Piştî serkeftinên Rojava û destkeftiyên gelê kurd Tirkiye peywendî durist kirin bi komên radîkal ên dijminê gelê kurd û ew bi ser Rojava de şandin û gelekî piştevaniya wan kir. Ji mêj ve ye peywendiyên Tirkiye û El Nûsra'yê tên zanîn. Hêzên kurd ew ê tu carî destûra wê yekê nedin ku planên qirêj ên li ser Rojava pêk werin."

Li hêla din Rawêjkariya YPG'ê ya Kobanê jî eşkere kir ku Tirkiye'yê 6 birîndarên YPG'ê radestî El Nûsra'yê kirine. Rawêjkariya YPG'ê ya Kobanê ji malpera xwe ya fermî daxuyand ku 6 şervanên YPG'ê yên li Tirkiye'yê di nexweşxaneyan de dihatin dermankirin ji hêla Tirkiye'yê ve radestî El Nûsra'yê hatine kirin.

### Salih Muslîm bi Mahmûd Abbas re civiya

Li hêla din desteye ku ji Hêzên Gorankariya Demokratên Netewî yên Sûriye'yê pêk tê bi Serokkomarê Filîstînê Mahmûd Abbas re civiya. Hevserokê PYD'ê Salih Muslîm jî beşdarî civîne bû. Hat zanîn ku di civînê de rûdanên krîza Sûriye û çareseriyên meseleyê hatine rojevê. Hat ragihandin ku civîn li paytexê Misirê li Kahîre'yê pêk hatiye û li ser çareseriya krîza Sûrie gengeşî hatine kirin.

Li hêla din hat zanîn ku meseleya krîza navxeyî ya Sûrîye bûye xala serekî ya civînê û di civînê de li ser agirbesteke mayînde, koçberî, mirina xelkên sivîl hatiye rawestandin û nîqaş li ser Sûriye'yeke girtî hatine kirin û rêyên çareseriyê bûne mijarên civîne.

### DAIŞ'ê êrîşî navçeya Karyataynê ya sûryaniyan kir

Êrîş û kavilkrina Sûriye ya ji hêla DAIŞ'ê ve jî berdewam dike. DAIŞ'ê herî dawî êrîşî navçeya Helebê ya Karyatanê kir û zêdetir ji 100 sûryanî dîl girt. Hat zanîn ku Metropolîtê Ortodoks ê Humûsê Selwanos Butros Metropolitin nameyek nivîsiyê û di nameyê de banga alîkariyê kiriye. Her wiha hat eşkere kirin ku metropolît di nameyê de daxuyandiyê ku zêdetir ji 100 malbatên sûryanî di destê DAIŞ'ê de nin.

Di nameyê de hat zanîn ku mêran ji bo parastinê çek hilgirtine jin û zarok jî ji bo herêmeke ewle hatine veguhestin. Her wiha li gor nameya metrpololît bi êrîşên DAIŞ'ê re zêdetir ji 1500 malbatên sûryanî ji malên xwe derketine û koçber bûne. Li gor daxuyaniya Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriye jî DAIŞ'ê 230 kes revandiye û ji wan zêdetir ji 60 kesî jî mesîhî nin. Her wiha hat eşkere kirin ku li derdora navçeya Şadadê jî di navbera rejimê û DAIŞ'ê de şer û pevçûnên dijwar hene. Di 2013'an de DAIŞ'ê êrîşî herêma Şadadê kiribû û 14 jin 2 zarok di nav de 46 kes qetil kiribû û Dêra Mor Mihail rûxandibû. Herî dawî di meha gulanê de jî metranek hatibû revandin.



### Mesûd Barzanî bi ENKS'ê re civiya

Li hêla din bu ku kêşe û pirsgirêkên di navbeyna hêzên kurd ên Rojava bên çareserkirin hewldanên Barzanî jî didomin. Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî ku ji roja destpêka krîza Sûriye'yê ve alîkariya kurdên Rojava dikir û ji bo hevgirtinek di navbera hêzên kurd de li Rojava pêk were hewl dide niha jî bi Encûmena Niştimaniya Kurd a Sûriyê (ENKS) re civiya. Li gor malpera fermî ya Serokatiya Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî, bi desteya Serokê ENKS'ê ya Îbrahim Biro re li bajarê Selahadinê hevdîtin pêk aniye.



Di civînê de desteya ENKS'ê hewla piştgirî û alîkariya Mesûd Barzanî ya ji bo Rojavayê Kurdistanê bilind nirxandiye spasiya Mesûd Barzanî kiriye. Li gor daxuyaniya malperê, di civînê de rewşa dawî ya li Rojava'yê Kurdistanê, parastina xelkê kurd a li hember komên tundirew, jiyana xelkê Rojava û aboriyê Rojava hatiye gengeşîkirin. Her wiha hat ragihandin ku hevgirtin û peywendiyên aliyên siyasî jî hatine rojevê û ji bo tiffaqa herdu aliyan nîqaş hatine kirin.

### 'Serçaviyên Rojava ji Esed re tên şandin'

Îbrahîm Biro li ser civîna bi Serokê Herêma Kurdistanê re kirine rawestiya û eşkere kir ku Mesûd Barzanî, ji bo hevgirtin û yekgirtina kurdan gelekî dixebite û civîna wan a dawî jî ji bo lihevkirina partiyên siyasî yên Rojava bûye. Her wiha Biro, ragihand ku ew amadene bi TEV-DEM'ê re rûnin lê belê TEV-DEM wan nas nake û polîtîkaya yekalî bi rêve dibe. Di berdewamiya azaftina xwe de Biro, da zanîn ku PYD leşkeriya neçarî li ser xelkê ferz dike û bi zorê xelkê dibe leşkeriyê. Biro her wiha, fişar û pêkûtiyên ji hêla PYD'ê li ser endamên ENKS'ê tên kirin jî rawestiya û wiha got: "PYD di gel fişara li ser me bi rejima Esed re jî kar dike, genim, ceh, nefta Rojava ji Esed re dişîne. Hemû kes karê PYD'ê dibîne. Xelkê Rojava birçî û perîşan e lê belê ew neft û xwirekên Rojava didin Esed."

### 'Pêşmerge di bin ala Kurdistanê de dicenge'

Her wiha di berdewamiya axaftina xwe de Biro, eşkere kir ku ew di civînê de li ser çûna Pêşmergeyên Rojava ya jî axivîne û ew hemaheng in û di wê baweriyê de nin ku divê Pêşmergeyên Rojavayê Kurdistanê li Rojava'bin û şerê DAIŞ'ê bikin. Biro li hember derketina PYD'ê ya ji bo vegera Pêşmergeyên Rojava bi tûndî rexne kir û da zanîn ku ew vê kiryara PYD'ê fêm nakin û tênagihên bê çima li hember berxwedana hêzêke Kurdistanê helwesteke wisa nîşan didin. Biro li ser daxuyaniyên PYD'ê yên ji bo Pêşmergeyên Rojava rawestiya û wiha berdewam kir: " Pêşmergeyên Rojava hemû ji ciwanên Rojava pêk tên. Hemû ji bo xaka Kurdistanê niha di sengerên şer de cih digrin. PYD dibêje, 'Werin têkevin bin ala me.' Rojava jî beşek ji Kurdistanê ye. Ne xaka YPG'ê, PYD'ê û ENKS'ê ye. Pêşmerge bi ala Kurdistanê li eniyên şer dicenge ne bi alên partiyên siyasî."

### 'Xelk ji PYD'ê aciz e'

Di berdewamiya axaftina xwe de Biro amaje bi wê yekê jî kir ku PYD û YPG ji tiffaq û hevpeymaniya komên îslamî re ne acize wan qebûl dike, bi wan re di eniyên şer de cîh digre lê belê ew ji tiffaqa kurdan direve û zemîna şerê navxweyî ava dike. Her wiha Biro da zanîn ku ji ber polîtîkayên PYD'ê di gelheya Rojava de gelekî guhertin pêk hatine û xelkê Rojava ji ber polîtîkayên PYD'ê cih û warên xwe dihêle û koçber dibe. Di dawiya axaftina xwe de Biro li ser baca PYD'ê ya li ser xelkê Rojava jî rawestiya û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "PYD'ê dest bi avakirina sazî û dezgehên nû kiriye xelkê ditirsîne û bi darê zorê bacê ji xelkê distîne. Li malbatên ku propagandaya PYD'ê nakin û bacê nadin gefa mirinê dixwin. Li Rojava mixabin kurd nema nin. Bi milyonan kurd ji Rojavayê Kurdistanê reviyan.

### Rûdaw hat qedexekirin


Televîyona Rûdawê ya ku berê peyamnêr û xebatkarên wê ji Rojava dihatin sirgûn kirin niha jî rastî ambargoyê hat. Rêveberiya herêma Cizîrê eşkere kir ku lîsansa Koma Medyayî ya Rûdawê hatiye betalkirin. Hinceta betalkirina lîsansa Rûdawê jî wiha hatiye aşekere kirin: "Dijminiya xelk, sazî û şehîdên kurd dike." Her wiha televîzyona Rûdawê bi tawana duristkirina şerê navxweyî û belavkirina bîr û boçûnên nijadperestî tê tawanbarkirin.

BasNûçe 10 - 16 Tebax 2015


# Kirmanckî de hîkaye ya nûjen




Nadire Güntaş Aldatmaz




















Hîkaye zereyê edebîyatî de cayode muhîm der a. Meseleyê ke zereyê hîkaye der ê, mîyanê zemanêde kilmî de cereyan kenê. Yanî hîkaye zereyê heyatêde dergî de cayode kilmek gêna. La no ca winî muhîm o ke ge-gane îstîqametê heyatî negatîf yan kî pozîtîf vurneno. Coka meseleyê ke behsê ci beno layîqê nuşnayene bîyê, coka wendoxan kî gênê binê tesîrê xo. Çike rastkên ê. Çike zereyê heyatê min û to ra ancînê we yenê. Ma vajî, bextîyarî, yewbinî resayene, dejê merdene, dejê cêrabîyayîşî, dejê eşqî, poşmanîye û rastîyê zê nînan ke ma her roje yenîme têrî û bi ziwanode edebî qelema nuştoxan ra vejînê, ci ra hîkaye vanîme. Helbet bitesîrbîyayîşê hîkaye de rolê ziwanê nuştoxan zaf o. Nuştoxî çiqas ziwanî weş û dewletî bişuxulnê, çiqas hakimê ziwanî bê, hende bitesîr benê.

Hîkaye kilmek a la eksê na kilmekîye wendoxan rê berê dinyayade girse û rengine kena ra. Nê beran ra her yew wendoxan beno ca bi ca fetelneno û heyatanê bînan rê keno mêman.

Hîkaye kilm a la hetê kilmbîyayîşî ra wayîrê avantajî ya kî. Çike demo modern de merdim nêşikîno ke seba wendişî zaf zeman abirno. Coka însanê nê zemanî herinda nêzan çend sey rîpelanê romanî de hîkaye tercîh keno. No durum (yanî kilmîya hîkayeyan) seba nuştoxan kî avantaj peyda keno. Nuştox/e, çi ke wazeno/a vajo, mîyanê zemanêde kilmî de nuseno/a.

**Edebîyatê Dinya û yê Tirkan de Hîkaye**

Tarîxê edebîyatê dinya de Boccacio (1349-1353), temsîlkaro verên yê hîkaye yeno qebulkerdene. Kitabê ey "Decameron" kî kitabê hîkaye yo tewr verên o.(1) Labelê hîkaye, esas seserra 19. de, çeşîtê edebîyatê bînan ra cêra bîye û zê çeşîtêde xoserkî dinyaya edebîyatî de ca girewt. Ê serran de, tayê romannuştoxê muhîmî kî bi hîkaye eleqedar bîyê. Mesela, êyê ke ma kî zaf rind nas kenîme ra Victor Hugo, Stendhal, Balzac, Flaubert, Tolstoy, Gogol û Dostoyevski eynî wext de hîkaye kî nuştê. Eleqeyê nuştoxanê zê nînan, cayê hîkaye kerdo berz û hîkaye mavênê eseranê edebî de, ca kerda.

Termê "Hîkayeya Moderne" kî verê cû hetê welatanê Rojawanî de, dima kî ma de, serê seserra 20 de vejîya meydan.

Edebîyatê tirkan de hîkayeya moderne kî binê tesîrê Rojawanî de peyda bîya û avêr şîya.

Înan de kî temsîlkarê hîkayeya moderne, Xalit Zîya (1866-1945) yo2. Umer Seyfedîn, Seîd Faîq, Xaldun Taner û Sebahedîn Alî kî temsîlkarê verênî yê hîkayeya tirkî yenê qebulkerdene.

Tirkî de tarîxê hîkayeya moderne teqabulê wextê komare (cumhurîyet) keno. Yanî hîkayeyê modernê tewr verêni serê seserra 20. de ameyê nuştene.

**Tarîxê Edebîyatê Kurdan de Hîkaye**

Ma ke "edebîyatê kurdan" va, gerek qalê lehçeyanê kurdkî pêrune bikerîme (kirdaskî, sorankî, lurkî, hewramkî û kirmanckî). Tayê lehçeyanê kurdkî de eserê zaf muhîmî vejîyê. Hem kî wexto ke nê eserî vejîyayî, ê cayan de fariskî û erebkî zaf populer û qewetin bîyê, ancî kî nê eserê kurdkî heta ewru ameyê.

Kurdkî de eserê klasîkî yê tewr kanî, seserra 8. de, hewramkî û lurkî ameyê nuştene. Goreyê Antolojîyê Şîiranê Kurdkî ke Selîm Temoyî amade kerdo, destpêkê edebîyatê klasîkî yê kurdan seserra 8. ra dest pêkeno. (Behlulê Mahî (ss. 8), Babe Raxê Hemzanî (ss. 8.), Babe Xatemê Loristanî (ss. 8.), Babe Serhengê Dewdanî (ss. 8.), Babe Gerçekê Hewramî (ss. 8.), Babe Tahirê Uryan (935-1010))3

No mevzû de çimeyode bîn kî neqlkerdişê Alexander Jabayî yo. Çîyo ke Fehîm Işik Jaba ra neql keno, heşt şaîrê ke lehçeyanê kurdkî ra (a ke tewr zêde qisey bena) kirdaskî de eserê klasîkî dayê kî nîyar ê: Elî Herîrî (1010-1078), Cizîrî (1566-1640), Feqiyê Teyran (1590-1660), Bateyî (1417-1491), Ehmedê Xanî (1650-1706), Îsmaîlê Bazîdî (1654-1709), Şeref Xanê Hekarî (1682-1748), Murad Xanê Bazîdî (1736-1778).4

Seke ma nê melumatî ra kî vînenîme, edebîyatê kurdan o klasîk heta seserra 8. sono. Dêmek ziwanê kurdan, hezar serrî ra jêder o ke dinyaya edebîyatî der o.

"Ewru, leyçeyanê kurdkî ra tena sorankî statuyêde xoyo resmî esto. Sorankî eynî wext de ziwanode zaf qewetin yê edebîyatî yo. Edebîyatê sorankî yo klasîk kî bi Nalî (1798 - 1878) dest pêkeno û şaîrê zê Hecî Qadirê Koyî (1815 - 1897), Pîremêrd (1867-1950) û Şêx Riza Talebanî (1831-1910) avêr sono."5

Mavênê nê eseranê klasîkan yê kurdan de, eserode kirmanckî çîn o. Ma ke edebîyato modern de nîyada kî durum eynî yo. Mesela, Mela Mehmûdê Bayezîdî, serra 1840 de, (rêça Mem û Zîne de) hîkayeya verêne bi kirdaskî nuşta. Dima serra 1912 de, hîkayeya ke Fuat Temoyî (Çîrok/Şewêş, Rojî Kurd) nuşta kî kirdaskî ya. Nînan ra dima hîkayeya "Le Xewma" ke Cemîl Saîbî (1887-1951) nuşta, a kî sorankî ya.

**Vizêr û Ewroyê Hîkayeya Kirmanckî**

Wexto ke ma konjokturê herême ard verê çiman vînenîme ke eserê klasîkî yê kurdkî hende senik nîyê. Hereketê nasyonalîzmê peynîya seserra 18. û serê seserra 19., împaratorîyê ê wextî kerdî vila û zaf miletan dewleta xo saz kerde. Wexto ke nê dewletî saz bî, tabî ke ê cayan de tena yew milet çin bî, yew kultur çin bî. Miletê bînî yê ke zereyê sînorê dewletan de mendî ê kî zafê cayan de bi zor asîmîle kerdî yan kî qeyret kerd ke asîmîle bikerê. Dewleta Tirkîya kî zereyê nê konjokturî de saz bîye. Îdeolojîyê xo yew milet û yew ziwanî ser o înşa kerd. Milet û kulturê bînî yê ke çend hezar serrî ra be nat tîya de ciwîyêne ge fîzîkî ge-gane kî kulturî qetl kerdî. Dewletê ke kurdan rê hukm kenê, kurdan asîmîle kenê ra tewr asîmîlasyonkara xo dewleta Tirkîya bîye. Kirmanckîya ke tena zereyê sînorê Tirkîya de qisey bena û tarîxê xo de qet ziwanode nuştekî nêbîya, binê tesîrê na polîtîka de zaf manena û heta nê serranê peyênan kî fealîyetode nuştekî hama hama nêbeno.

Ma ke kirmanckî veracerê lehçeyanê bînan kerd vînenîme ke tarîxê edebîyatê kirmanckî yo nuştekî tewr newe yo. Coka kirmanckî de edebîyato fekkî zê yê lehçeyanê bînan belkî înan ra kî zêde avêr şîyo. Ewru kî no edebîyato fekkî beno bingeyê edebîyatê nuştekî. Edebîyato ke bingeyê xo qewetin o û na qewete ra beno weye, gerek bi xo kî qewetin bo û xo rê îstîqbalode zaf rind bivirajo. Nika ra sînyalê na rindîye asenê.

Her çiqas ke mewzûyê nê nuşteyî hîkaye ya kî gerek merdim, heta ke qalê nuşteyanê tewr verênan nêkero, ranêvêro. Metnê nuştekî yê tewr verênî yê Peter Îvanovîç Lerchî yê. Ey çarçewaya gureyê xo de çend sanik û meseleyî arêdayê û nuştê. Çîyo ke ma zanenîme, Lerchî ra avêr metnode nuştekî çin o. Na mana de metnê ey muhîm ê.

Wextê herbê Qirimî de (4.10.1853 - 30.04.1856) tayê eskerê Osmanî sey hesîran kewtê be destê rûsan. Çend aşmî uca de hesîr mendê. Nê hesîran ra çend teney kî kurd (kirdasî û kirmanc) bîyê. Peter Lerch nê hesîran de qisey keno, sanik û meseleyê ke înan ra goşdarî kerdê serra 1857 de Petersburg de weşaneno. Metnê kirmanckî yê tewr verênî bi no tore, bi tesaduf hetê merdimêde xerîbî ra yenê nusayene.

Metnê verênî yê ke kirmancan bi xo nuştê ra yew "Mewlûdê Kirdî" yê Ehmedê Xasî (1867-1951) yo, serra 1899 de Dîyarbekir de weşanîyeno. O bîn kî "Bîyîşa Pêxamberî" yê Osman Efendîyê Babijî (1852-1929) yo û serra 1933 de Şam de hetê Celadet Alî Bedirxanî ra weşanîyeno6.

Nê metnê ke qelema her hîrê nuştoxan ra vejîyê, çiqas ke bingeyê ziwanê nuştekî bivirazê û zaf muhîm bê kî zereyê edebîyatî de saye benê-nêbenê hîna mewzûyê munaqeşeyî yo.

"Ma nêşîkîme ke vajîme edebîyatode klasîk yê kirmanckî esto. Ziwanê mewlidan çiqas ke estetîk o kî, nê, zereyê edebîyatî de saye nêbenê, çike eserode edebî de gerek fiction (kurgu) bibo."7

Nê çend metnê nuştekî ra tepîya heta peynîya serranê 1970yan bi kirmanckî xebatade nuştekî çin a. Çike o wext, qiseykerdena kurdkî qebhet a. Kamî ke qisey kerd, goreyê qanûnê qebhetan ra sereyê çekuye gerek pere bido.

**Hîkayeya Verêne**

Kirmanckî, ancax nê serranê peyênan de eve hîkayeyade moderne kewta dinyaya edebîyatî. Hîkayeya ke ma destpêkê edebîyatê kirmanckî qebul kenîme "Engiştê Kejê" ya. Na hîkayeya Malmîsanijî serra 1980 de kovara Tîrej, hûmara 2. de weşanîyena. Malmîsanij, eve na hîkayeya xo çêverê kirmanckî rê edebîyatî keno ra.

Hîkaye, sey dîyalogî mavêne Keje û malimê dewe de vêrena ra. Hîrê pêçikê Keje şikitayî yê. Malimê dewe, ci ra sebeb pers keno. Keje kî cewab dana. Orteyê cewabanê Keje de ma têkîlîya kurdan û dewlete vînenîme. Yanî hîkayeya verêne, zulmo ke dewlete ere dewijan kena, ser o ya.

**12 Êlule ra Tepîya**

Weşanayîşê na hîkaye ra dima derbeya 12 êlule bena û çêvero ke kirmanckî rê tenê bîyo ra, tepîya yeno girewtene. Kesê ke bi kirmanckî eleqedar ê, zulmê 12 êlule ver sonê teverê welatî û tever ra kî bi gureyê xo seba kirmanckî şansê peyda kenê.

Hîkayeya diyine yê kirmanckî kî teverê welatî de serra 1995 de kovara Çira de weşanîyena. A verêne ra tam 15 serrî dima, eve a diyine çêverode bîn kirmanckî rê beno ra.

Hîkayeya diyine (Derdê Dewrêşî) yê J. Îhsan Esparî ya. Espar hîkayeya xo de mavênê atmosferê ê wextî de, halê şarê Dîyarbekirî û zulmê dewlete, problemê nêzanayena tirkî bi ziwanode trajîkomîk qisey keno. Hîkayeya diyine kî polîtîk a. Unca tey zulmê polîs û eskerî esto.

Serra 1995-96 de di hîkayeyê Serdar Roşanî (Bircanê Dîyarbekirî ra Mektubêke û Gozêre) verî bi kirdaskî nusîyenê û tayê kovaran de weşanîyenê la dima nuştox bi xo tercumeyê kirmanckî keno û unca kovara Çira de weşanîyenê.

**Avêrşîyayîşê Edebîyatê Kirmanckî de Cayê Kovaran**

Kovarê edebî, avêrşîyayîşê edebîyatî de zê mektebî yê. Çitur ke kovarê edebî, avêrşîyayîşê hîkayeya tirkî de rolêde bingeyîn der ê, yê kurdkî de, cayê xo di qatî dahîna muhîm o.

Mesela, kovara Hawarî, hûmara xo ya verêne serra 1932 de, Şam de vezêna û temelê hîkayeya moderne nana ro. Kovara Gelawêjî hûmara xo ya verêne serra 1939 de vezena, a kî bena mektebê edebîyatê modernî yê sorankî.

**Vate**

Kovara kirmanckî ya verêne Vate kî serra 1997 de, Swêd de dest bi weşanayîşî kena. Çitur ke kovara Hawarî seba kirdaskî, kovara Gelawejî seba sorankî bîya derguşa edebîyatê modernî, kovara Vateyî kî seba kirmanckî bena derguşe, bena mektebê edebîyatê modernî.

Vate, seba hîkayeya moderne kî cayode zaf muhîm der a. Heta ewru 39 humaranê Vateyî de 72 hîkayeyî weşanîyayê8.

**Şewçila**

Seba avêrşîyayîşê hîkayeya kirmanckî kovarade zaf muhîma bîne kî Şewçila ya. Hûmara Şewçila a verêne wisarê serra 2011î de vejîye û heta nika des hûmarê xo kerdî temam. Des hûmaranê Şewçila de 82 hîkayeyî weşanîyayî. Eve Şewçila zaf kesî dest bi nuştiş kerd. Zafê nê nuştoxan hîkayeyî nuştî. Cayo ke ewru hîkaya kirmancî sayeyê Şewçila de resta ci, seba hîkayeya kirmanckî cawode zaf berz o.

82 hîkayeyê ke Şewçila de weşanîyayê ra 32 teneyî yê cinîyan ê9. Nê serranê pêyenan de nuştişê cinîyan ke bi Şewçila dest pêkerdo kî seba kirmanckî çîyode zaf newe yo. Cinîyê ma yê ke sey vatena Nazim Hîkmetî "Êyê ke sifre de cayê xo gayê ma ra tepîya yeno…" dest est bi qeleme. Êdî cinî kî derdê xo, kederê xo ziwanê xo de nusenê. Edebîyatê kirmanckî yo ke hona destê cinîke nêkewto ro ci, hona tey vengê cinîke berz nêbîyo, helbet kêmî yo. Na kêmîye hêdî-hêdî bena vîndî û cinî tîya de kî vengê xo kenê berz.

Tarîxê hîkayeya ma de weşenayîşê hîkayeya verêne ra 15 serrî tepîya a diyine û hîrêyine ra kî tepîya, serra 2002î de eve kitabê Roşan Lezgînî "Binê Dara Valêre de" çêverê edebîyatî, kirmanckî rê ancî beno ra. Dima heta serra 2010, serre de, ge-gane jew-di kitabê hîkaye vejînê, tayê serran de kî qet nêvejînê.

Ancax serranê 2012-13 de, yanî nê di serranê peyênan de eserê kirmanckî zaf jêdînê. Sebebê nê jedîyayîşî yo muhîm:

1-Atmosfero polîtîk vurîya. Unîversîteyan de qismê ziwan û kulturê kirmanckî û kirdaskî bî ra.

2-Kirmanckî û kirdaskî mekteban de zê dersa weçinitîye ameyî qebulkerdene. Seba derse, kitabî amade bî.

3-Weşenayîşê kovaran (Vate, Şewçila).

Mordem şikîno ke vajero, tarîxê hîkayeya kirmanckî de cawo ewruyên, cawo tewr berz o. Yanî performansê nê di serranê peyênan, se serra verêne ra jêder o.

www.arsivakurd.org

www.arsivakurd.org

## Kaan Dilek:

# Gavên Îranê cihê gûmanê ne!

Siwar Bedirxan

Demeke dirêj e tifaq û peymanên nû yên Neteweyên Yekgirtî û Amerîka'yê yên bi dagirkerên Kurdistanê re dike di rojeva hemû kurdan de ye û li ser van peymanan niqaş tên kirin. Piştî "Tiffaqa Încîrlîkê" ya Amerîka û Tirkiye'yê, Tirkiyê dest bi bomberbarana baregehê PKK'ê kir û hurgiliyên tiffaqa wê ji teref raya giştî ya cihanê ve hat zanîn. Li hêla din piştî peymana welatên P5+1 a bi Îranê re Serokkomarê Îranê Hesenê Rûhanî serdana Parêzgeha Kurdistanê kir û di çerçoveya mafên civakî de gelek qewl dan xelkê kurd. Dr. Kaan Dilek li ser rûdanên dawî yên li Îranê rawestiya û qewlên Hesen Rûhanî yên li Parêzgeha Kurdistanê ji BasNûçeyê re eşkere kir û daxuyand ku Îran dixwaze bide xuyakirin ku wê li hember kurdan proseya demokrasiyê daye destpêkirin û ew mafê kurdan dide wan. Lê belê nayê zanîn bê ka di naveroka proseya Îranê de çi heye û gavên ku tên avêtin jî cihê şik û gumanê ne.



**Gavên Îranê yên ber bi kurdan ve her çend weke proseyeke demokrasiyê xwiya bikin û bên şîrovekirin jî ew gavên stratejîk in. Eger bi rastî jî Îran ew ê proseya demokrasiyê bide destpêkirin li hember kurdan, divê Parêzgeha Kurdistanê ji nav herêma leşkerî derxe. Eger Tehranê tiştekî wisa pêk anî wê demê ew ê baweriyek bi raya giştî re pêk were.**

**Peymana Îran û welatên P5+1 dê çi tesîrê li polîtîkaya Îranê ya li ser kurdan bike? Geşedanên dawî yên li Rohilata Navîn ewê polîtîkaya Îranê biguherînin?**

Di naveroka peymana Îran û welatên P5+1 meseleyên herêmî nehatine rojevê. Herdu terefan jî behsa meseleyên Îranê yên navxweyî û herêmî nekirine. Hikûmeta Tehranê ragihand ku hemû daûstendin li ser lihevkirina nûklerê pêk hatine. Di vê çerçoveyê de eger em li meseleyê binerin; em nikarin bêjin ku ew ê Îran di çerçoveya peymana nûklerî de polîtîkaya xwe ya li ser kurdan biguherîne. Lê belê Hikûmeta Tehranê, bi taybetî piştî destkeftiyên kurdan ê li Sûriyê û Iraqê polîtîkaya xwe ya li hemberî kurdan guhert. Îran niha di nava hin hewldanan deye ku dev ji kiryarên xwe yên berê berde. Tiştekî din heye ku divê ez bêjim. Tehran proseya çareseriyê ya li Tirkiyê ji nêz ve dişopand. Îran jî dixwaze peywendiyan xwe yên bi kurdan re durist bike. Em dikarin eşkere bikin ku Îran li derfetekê digeriya ku ew jî bi kurdan re proseyeke aştiyê û çareseriyê saz bike. Di van demên dawî de rêvebirên Tehranê di vê çerçoveyê de çend daxuyanî belav kirin. Eşkere dikin ku ew jî di çareseriyê û lihevkirinê de bi biryar in. Bi taybetî serdana serdana Hesenê Rûhaniyê Serokkomarê Îranê ya ji bo Sinê û qewla wî ya ji bo vebûna beşên kurdî li Zankoya Kurdistanê didin eşkere kirin ku li Îranê jî ji bo kurdan proseyekê dest pê kiriye.

Li hêla din li Rojavayê Kurdistanê Îranê alîkariya PYD'ê dike û gelek caran ji bo peydakirina çekan hewlên mezin dane. Ev hewldanên Îranê gelekî hatin rexne kirin. Îranê roleke mezin girt ser xwe. Di vê çerçoveyê de em dibînin ku Îran jî dixwaze bi kurdan re hemaheng be û ew jî di nava tevgera kurdan de cihê xwe bigre.

Dema ku em bên ser kurdên Rojhilatê jî divê em tekez bikin ku ew ê Îran gavên biçûk biavêje. Lewre Îran ji mêjdeye Rojhilatê Kurdistanê weke herêma leşkerî binav kiriye û kurdên Rojhilata Kurdistanê wisa bi rêve dibe. Bi salane vê yekê berdewam kiriye. Di kurtedemekê de guhertina vê polîtîkayê ew ê ne hêsan be. Her çend hêla siyasî bikeve nav hewldaneke wisa jî li hêla din Artêşa Şoreşê jî heye. Ew ê çiqasî destûra vê yekê bidin ev hemû kêşe nin.

**Dema ku têkçûna DAIŞ'ê ya li Iraqê û Herêma Kurdistanê tê gengeşî kirin, behsa şerekî nû vedibe. Tê eşkere kirin ku ewê di navbera milîşeyên Şîe Haşdi Şabi û hêzên kurd de şerekî nû rû bide. Egera vê yekê heye gelo?**

Îran li hember êrîşên DAIŞ'ê yên li ser Hewlêrê Bexdayê rawestiya û yek ji wan dewletên sereke bû ku ji Hewlêrê re çek şand. Îran ji bo berjewendiyên xwe hem bi Bexdayê re kar dike û hem jî bi Hewlêrê re. Stratejiyeke du alî bi kar tîne. Îran li hember êrîşên DAIŞ'ê yên li Kurdistanê û Iraqê sekinî û dest bi avakirina bereyeke Şîe kir. Armanca wê ew bû ku şer li Iraqê zêde belav nebe û destkeftiyên wê nekevin xetereyan.

Amaje bi wê yekê dihat kirin ku ev milîşê bi lez û bez hatine avakirin û ew li hember êrîşên DAIŞ'ê şer dikin û ew ê ji hêla otorîteyên Iraqê ve bêne qebûl kirin. Lê belê her wiha egera wê yekê jî heye ku ew milîşeyên Şîe piştî DAIŞ'ê ji hêla Îranê ji bo berjewendiyan bên bikaranîn. Li hêla din tê eşkere kirin ku Herêma Kurdistanê amadekariyên serbixwebûnê dike û ew ê milîşe li hember serbixwebûnê weke stratejî bên bikar anîn. Li hêla din jî tê gotin ku ew ê ew milîs di egera şerê Kerkûk Musilê de bêne bikaranîn. Dema ku em li dirêjiya demê dinêrin em dibînin ku ji berê de pevçûn di navbera herdu bereyan de pêk hatiye. Dibe ku siberojê dîsa şerekî wisa pêk were. Lê belê danûstendin û hevkariya Hewlêrê ya bi welatên navdewletî re dikarin rê li ber van pevçûnan jî bigrin. Hemû mesele nefta Musîl û Kekûkê ye. Çavê hemû dewletên herêmê li nefta Musil û Kerkûkê ye.

**Serdana Serokkomarê Îranê Hesenê Rûhanî ya ji bo Parêzgeha Kurdistanê û hin qewlên wî yên li ser vebûna beşên kurdî li Zankoya Kurdistanê tên çi wateyê? Gelo Îran dixwaze bi kurdan re li hev bike?**

Di nav sînorên Îranê de ji her baweriyê, ji her neteweye mirov hene û Îran weke mûzexaneye ser vekirî ya bawerî û neteweya ne. Di sînorên Îranê yên rojhilat de kurd û tirkmn cih digrin. Eger Îran li sînorên xwe yên rojhilat proseyeke demokrasiyê bide destpêkirin bê gûman ew ê ne tenê kurd di nav wê proseyê de bin. Divê tirk, tirkmen, ereb, belûc jî di nava wê proseyê de bêne bi cih kirin. Lewre eger Îran proseyê bi tenê ji bo li hevkirina bi kurdan re proseyekê bi de destpê kirin ew ê ev yek bibe cihê nerazîbûna hin neteweyên din û ew ê dest bi xwepêşandanan bikin. Proseya demokrasiyê ya Îranê ku ji bo kurdan ew ê kurt be û di ne berfireh be. Pêdiviya Tehranê ne bi proseyan bi pêngavên demokratîk hene. Îran beriya hemû tiştî divê di vê çerçoveyê de hin gavan biavêje. Lewre weke ku min got, li Îranê gelek û ol, bawerî û neteweyên cûda hene. Eger ji bo ayîn û neteweyan prose dest pê bikin ew ê bê encam bin. Li hêla din divê rewşa dawî ya li Rojhilata navîn de bendewariyên pêkhatina pêngavên demokrasiyê jî ew ê çiqas rast be? Divê em vê yekê jî şîrove bikin.

Gavên Îranê yên ber bi kurdan ve her çend weke proseyeke demokrasiyê xwiya bikin û bên şîrovekirin jî ew gavên stratejîk in. Eger bi rastî jî Îran ew ê proseya demokrasiyê bide destpêkirin li hember kurdan, divê Parêzgeha Kurdistanê ji nav herêma leşkerî derxe. Eger Tehranê tiştekî wisa pêk anî wê demê ew ê baweriyek bi raya giştî re pêk were. Eger ne wisa be ew gav ew ê samîmî neyên dîtin. Xulase Îran dixwaze bide xuyakirin ku wê li hember kurdan proseya demokrasiyê daye destpêkirin û ew mafê kurdan dide wan. Lê belê nayê zanîn bê ka di naveroka vê proseya Îranê de çi heye. Her wiha gavên tên avêtin jî cihê şik û gumanê ne.



**Gelo çima di nava 10 -15 salên dawî de Îranê dest bi têwerdana nav gelek welatên Rojhilata Navîn kir? Îran çawa wisa bi hêz bû?**

Eger ku em behsa hêza Îranê ya li Rojhilata Navîn bikin û em amaje bi terefgirên wê bikin rast e. Îran xwedî hêzêke mezin e. Destê Îranê di nav gelek welatên herêmê de heye. Bê gûman xwedî hêzeke mezin e. Hemû kes dizane ku ew ê Îran dest bi firehkirin û mezinkirina sînorên xwe neke. Lê belê hemû kes jî dizane Îran li Rojhilata Navîn xwedî hêzeke mezin e. Li hêla din tê dîtin ku Îran hêza xwe ya li herêmê ji bilî edebiyata olî û mezhebî wernagire. Gelek tiştên din jî hene. Pêywendiya wê bi Sunneyên bi Filîstînê re, her wiha danûstendinên bi Ummanê re, peywendiyên bi Tacikîstan û Afganistanê re di vê çerçoveyê denin. Ev peywendî û tiffaqa wan a bi Îranê re ne olî û mezhebînin. Ew çandî û ferhengî nin. Îran di polîtîka û stratejiya navdewletî de olê, mezhebe, çande, kulturê bikar tîne. Ev yek jî desê wê bi hêztir dike. Hêza Îranê ya li herêmê ji vir te. Li Rojhilata Navîn gelek kom û grub bi ser Îranê ve nin.

Dema ku em li dîroka Îranê dinêrin em dibînin ku li hember emperyalîzmê peywendî duristkiriye bi kom û bereya çep re. Li hember emperyalîzmê piştevaniya bereya çep kiriye û li wir jî bûye xwedî gotin. Ji ber vê yekê jî li herêmê tiştê ku destê Îranê qewî dike mezhebî ye. Îran ji ber van tiştan xwedî hêzeke xurt e li herêmê. Bi taybetî ev rewşa Îranê piştî rûxîna rejima Seddam hat rojeva siyaseta nevdewletî û gelekî hat gengeşîkirin. Sedema vê hêza Îranê jî ew bû ku Tehranê dixwest ambargoya li ser xwe têk bibe û di egera şerekî de bereyên xwe yên parastinê zêde bike. Îran dixwaze li herêmê gelek bereyên wê yên siyasî û leşkerî hebin.

**Pêşmergeyên Rojhilatê Kurdistanê yên ku ev 25 sal e li hember Îranêdi şer dane rawestandin niha li ser sînorên Başûrê Kurdistanê û Rojhilatê Kurdistanê bi cihbûne. Egera wê heye ku li hember Îranê şer bidin destpêkirin?**

Partiyên kurd ê li Îranê partiyên kurdan ê herî qedîm û kevn in. Tecrûbe û azmûna KDPÎ'yê ya dewletê, şer û aştiyê pirr kevn e. Di nav partiyên kurdan de ya herî xwedî azmûn û qewî PDKÎ'ye. Ji bilî KDPÎ'yê niha PJAK'a bi ser PKK'ê jî li Rojhilatê Kurdistanê ji hêla xelkê ve tê ecibandin û xelkê kurd piştevaniya wê dike. Lê belê di her demê de polîtîkaya Îranê ya kurdan li gor peywendiyên wê



û PJAK û PKK' ê teşe girtine. Em yek ser dikarin bibêjin ku ew ê ji bilî PKK'ê û PJAK'ê hêzêke kurd li herêmê bibe xwedî fişar. Îran dixwaze PKK di nav sînorên Herêma Kurdistanê de bimîne û li hember wê şer neke. Armanca wê ev e. Naxwaze PKK û partiyên din ê kurd li hember wê şer bikin. Li hêla her partiyeke siyasî ya Herêma Kurdistanê bi Îranê re xwedî peywendiyên cuda nin. Peywendiyên cuda yên partiyên siyasî yên Herêma Kurdistanê bi Îranê re hene. Ez di wê baweriyê de me ku partiyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê jî ne stratejiya şer, stratejiya demokrasiyê bikar tînin. Dixwazin Îran dev ji hin kiryaran berde. Şerê partiyên kurd her çend ji hêla Tehranê neyê xwestin jî di warê stratejîk de ew ê şer bi kêrî Îranê were. Tehran ne ji şerê kurdan ji xwepêşandan û çalakiyên wan ê medenî û sivîl ditirse.

**Ezê dîsa bêm ser daxuyaniya Hesenê Rûhanî, Hesenê Ruhanî di serdana Parêzgeha Kurdistanê de got; "Eger Îran nebûya, ewê DAIŞ niha li Bexda û Hewlêrê bûya" Gelo çima serokkomarê Îranê ev yek got? Li hêla din Herêma Kurdistanê di qonaxa serxwebûnê de ye. Piştî ragihandina serxwebûnê ewê peywendiyên Îranê û Herêma Kurdistanê çawa bi rêve biçin?**


Bê gûman ev gotinên Hesenê Rûhanî gotinên gelekî qelew in. Lê belê divê bê dîtin ku Îranê li hember DAIŞ'ê bi aktorên herêmê re gelek danûstendin pêk anîn. Li hember DAIŞ'ê gelek stratejiyên nû saz kir. Peywendiyên Hewlêr û Tehranê gelekî kûr û dîrokî nin. Hin cara di navbera wan de şer pêk hatiye û hin caran jî aştiyên mayînde û mezin rûdanin. Hewldanên serbixwebûnê yên Herêma Kurdistanê divê di gel du biryardarên herêmê re hemaheng bin. Di vê çerçoveyê de yek ji van dewletan Îranê ya din jî Tirkiye. Ew ê Hewlêr, hem ji bo hevalbendên xwe yên rojhilatê Îran, Çîn, Rûsyayê û hem jî ji bo hevalbendên xwe yên rojava Tirkiyê, Amerîka û Yekîtiya Ewrûpayê siyaseteke hemaheng birêve bibe.

Diroka siyasî ya kurd ji berê de di derbarê siyaseta herêmê de xwedî azmûnekê ye. Bi taybetî cenabê Mesûd Barzanî û cenabê Celal Talabanî di vê yekê de xwedî azmûnên serkeftî ne. Ji ber van egeran jî ew ê peywendiyên Hewlêr û Tehranê berdewam bin. Her çend ku peywendî bên asta pevçûnan jî ew ê ev yek zêde berdewam neke û peywendiyên tekûz pêk werin. Ew ê herdu bere jî ji bo destkeftî û berjewendiyan hin caran pevçûnê bînin rojeva xwe.

Gelek caran dema ku krîz rû dide û Herêma Kurdistanê nikare nefta xwe bifroşe û bide Tirkiyê wê dide Îranê, ji ser Îranê neft diçe. Li hêla din em dibînin ji deriyê Elî Ûmran bazirganiyek mezin di navbera Îranê û Herêma Kurdistanê de heye. Herêma Kurdistanê di vi warî de serkeftiye û siyaseteke baş birêve dibe. Îran jî tu carî deriyê xwe ji kurdan re nagire. Behsa xetên enerjiyê tên kirin û tê gotik ku ew ê ji ser deriyê Elî Ûmranê xetek bê duristkirin ji bo şandina nefta Kurdistanê ev mimkûne pêk were. Hem pêdawîstiya Îranê bi vê yekê heye û hem jî pêdawîstiya Herêma Kurdistanê bi rewşeke wisa heye. Rewşeke wisya ew ê gelekî bi kerî Kurdistanê were. Ew ê di warê hinartina neftê de tihet bibin.

### Kaan Dilek kî ye?

Dr. Kaan Dilek di sala 1974'an de li Stenbol ji dayik bûye. Piştî xwendina dibistana navîn derbasî Îranê bûye û li Zankoya Tehranê di beşa Ziman û Edebiyata Farisî de dest bi xwendina lîsansê kiriye. Piştî lîsansê Dilek di heman beşê de master û doktora wergirtiye û li Îranê gelek salan rojnamegerî kiriye. Li ser polîtîkayên derve yên Îranê, mezheba Şîetiyê gelek makale û pirtûk nivîsîne. Dilek niha jî li Enstîtuya Lêkolînên Aborî û Civakî (SESA) Navenda Lêkolînên Aştiyê yên Rojhilata Navîn (IMPR) de weke pisporê Rojhilata Navîn kar dike.



# DÎLOK

Li herema Entabê, nawenda yekem a rûniştvaniyê ku dîroka niviskî qeyd kiriye, bajarê Dolikê ye. Ev der 10 km li bakûrê bajêr e û nêzî gundê Dîlokê ye. Navê vê nawendê di çavkaniyên Bîzansiyan de wek 'Telûk', di çavkaniyên Ereban de jî wek 'Dîba' derbas dibe.

www.arsivakurd.org





Welat Baz

"Her çar aliyê Entabê sor e, girên sor, axa sor. Bajêr ji dûrî ve tê dîtin. Zeytûnên zîvrengî, rezên zerî... Li ser Entabê ewrên şîrspî hene. Axa Entabê... ji keska herî kesk, ji sorê herî sor. Mirov zane ku dikeve bajarekî cuda. Bîhna îsotan tê pozê mirov. Ji dikkanan dûyê kebaban bilind dibe, bîhna goştê şewitî digere li kolanan. Belê, Entab devereke çetin e', dibêje nivîskarek.

Bajarê Entabê, yanê Dîlok, xaka Sûrî, Tirkiye û Kurdistanê digîhine hev. Bi gotineke din sînorê nav Kurdistan û Sûrî û Kurdistan û Tirkiyê ye. Rêya hevreşîm, rêya ku ji ser Helebê ve alema ereb bi Anatolya û Derya Spî ve girê di de ji Dîlokê derbas dibe. Serîkî vê reyê heta Hindistanê, seriyê din jî heta Awrûpa dirêj dibe. Ji ber ku welatê ereban, welatê kurdan û welatê gelên Anatolyê digîhîne hev, di warê jeopolîtîka xwe de heremeke girîng e.

## Erdnîgar

Bajêr di nav hêlîlarên 36 û 38 û di nav hêlîpanên 36 û 37an de ye. Pîvana xaka Entabê tevî bajarê Kilîsê 7642 km² ye. Erdîma Entabê % 51,9 çiya, % 26,9, deşt, % 2,2 zozan û % 18,0 jî plato ye. Erdnîgara bajêr ku ber bi deşta Başûrê Rojavayê Kurdistan û deşta Sûrî firehdibe, bilindahiya xwe wenda dike. Bilindahiya bajêr ji deryayê 850 metre ye. Çiyayên ku dikevin nav sînorê Entabê ji bakûr ve diherikin nav axa bajêr. Ev çiya ji rêza Torosên rojhilatê başûrin û wek sîlsîleyekî dikevin nav Antaqya, Mereş û Entab ê. Girê herî mezin li Çiyayê Sofê ye û 1496 metre ye. Çiyayên din di axa Dîlokê de evin: Çiyayê Babaxenî (1100m), Çiyayê Babadîlok (1250m), Çiyayê Gurenîz (1069m) Çiyayê Xurşîd, Çiyayê Reş, Çiyayê Amanos û Çiyayê Sam.

## Fistiq

Berhemekî van deştan ku Entabê bi cîhanê daye naskirin, fistiqin. Di demên kevn de ji ber ku bazirganiya van fistiqan ji alî bazirganên Şamî ve dihat kirin, navê vê berhemê wek 'Şamfistiq' maye. Lê belê, li gor hilberên Dîlokî, welatê fistiqan Entab e. Fermandarê Îskender Vitellus, vê fistiqê bi xwe re biriye İtalya û ji vir jî, li Fransa û İspanya belav bûye. Îro ji bilî Kurdistanê ev fistiq li Îran, Afxanistan, Hindistan, Amerika û li Başûrê Awrûpa tê çandin. Lê belê ji alî lezzet û rûnê xwe ve cûrê herî baş fistiqa Kurdistanê ye. Nîsbeta qaloriya wan bilind e. Naweroka fistiqa Entabê ji % 50 rûn, ji % 20 proteîn û ji % 15 karbonhîdrat e.

## Sanayî

Entap li ser xaka Bakûrê Kurdistanê bajarê herî dewlemend e. Sanayiya bajêr di aboriya Kurdistan, Tirkiye û Rojhilata Navîn de jî cîhekî mustesna digre. Bi vê taybetiya xwe nawendeke bazirganiyê ye ku Tirkiyê û Kurdistanê digîhîne hev. Ji ber ku li ser rêyên navnetewiye, nawenda derfirotina welatên ereb e jî. Ji % 5ê kargeh û fabrîqayên Tirkiyê li Entabê ne. Li bajêr sê heremên organîze ê sanayiyê hene. Li wan hereman bi hezaran fabrîqa û kargeh di faaliyetêde ne û li ser 1200 hektar ax hatine sazkirin. Her sê herem li gor beşên hilberînê ji hev diqetin. Di herema yekem de fabrîqe û kargehên avakirin, makîne, metal, boyax, kîmya, plastîk, hesin, kaxiz cîh digrin. Di herema dûyem de; bi giranî tekstîl û xwarin cîh digre. Înşaata herema sêyem jî hîn didome.

## Rêvebirî

Entab, ji başûr ve cîranê Afrîn û Helebê, ji rojava ve cîranê Edenê û Antaqyê, ji bakûr ve cîranê Mereş û Semsûrê, ji rojhilat ve jî cîranê bajarê Ruha yê ye. Bajarê Entabê bi hijmara şêniya xwe li Bakûrê Kurdistanê yek ji bajarê herî qelebalixe. Şêniya bajêr nêzî milyon û nîvek e. Ji ber dewlemendî û pêşketina sanayiyê, Dîlok her tim hedefa koçberiya aborî ye. Herwiha li bajêr zanîngeheke mezin jî heye ku, her sal bi hezaran xwendekar dihewîne. Bajarê Dîlokê li gor sîstema rêvebiriya Tirkiyê parêzgeh e. Navçên bi navê Ereban, Belkîs, Çînçîn, İslahiye, Tilbeşer, Nûrdax û Qargamîş bi Entabê ve girêdayîne.

Di salên dawîn de Navça Kilîsê, wek parêzgehekî ji Entabê hat veqetandin. Xopanên Musaeli, Polateli, Elbey jî wek navçe bi Kilîsê ve hatin girêdan. Tewî ê ku bi Kilîsê ve girêdayîne, 17 nahiye û 616 gundên Entabê hene. Bajêr ji aliyê demoxrafya xwe ve tevlîhev e. Piraniya rûniştvanan kurd in. Ji kurdan jî gelek Elewî ne. Li nawenda bajêr, li navçe ya Belqîs, yanê Nizîbê û li Kilîs û li derdorê turkmen jî dijîn. Ev turkmenan di dema Osmaniyan de li Kurdistanê hatine bicîh kirin.

Heta salên dawîn li bajêr gelek cihû, ermenî û suryanî jî hebûn. Ermeniyên Entabê ji ber tadeyên İtîhat û Terakkî, di salên şerê yekem de koçî Sûrî kirin. Cihûyan jî di salên 1950'an de berê dan İsrailê. Ji ber ku cemaata wan nemane, paristgehê van eqeliyetan, dêr û sînangogên wan jî êdî hatine girtin. Salên dawî ku Entab bû nawenda koçberiyê, ji bajarên derûdorê û heta ji deverên Kurdistanê ê dûr jî gelek malbat li Entabê bicîh bûn. Bi taybetî piştî qirkirina Mereşê a 1980'an bi sedan malbatên Elewiyên kurd, berê xwe dan bajêr. Piştî pêlên koçberiyê Dîlok bû metrepolekî mezin.

## Nav

Li herema Entabê, nawenda yekem a rûniştvaniyê ku dîroka niviskî qeyd kiriye, bajarê Dolikê ye. Ev der 10 km li bakûrê bajêr e û nêzî gundê Dîlokê ye. Navê vê nawendê di çavkaniyên Bîzansiyan de wek 'Telûk', di çavkaniyên Ereban de jî wek 'Dîba' derbas dibe. Tê hezrkirin ku navê Dîlokê ji vir tê. Çavkaniyên dewleta Selevkosan û Romayiyan jî heremê wek 'Antaqya ya Torosan' binav dike. Di dema seferên Xaçiyan de dîroknûs Mateos û Papaz Grîgor, navê heremê wek 'Hantap' dibêjin. Bajêr di heman salan de di çavkaniyên Ereban de wek 'Ayntab', di ê Ermeniyan de jî wek 'Anthapt' derbas dibe. 'Eyntab' bi zimanê Erebî tê wateya; 'Kaniya Xweş'. Dîsa zanist Bedredîn Aynî ku ji Entabê yê, dibêje, navê bajêr ê kevn 'Qala yî Fusûs', yanê 'Kela Gustîlka' bûye.Piştî salên Şerê Cîhanê ê Yekem, ku bajêriyan li dijî dagira Fransiyan berxwedan, navê bajêr ji alî Meclîsa Tirk ve wek 'Gazîayintap' hat danîn û paşê jî wek 'Gazîantep' hat guhertin. Bajêr niha jî di nav Kurdan de wek 'Entab' an jî 'Dîlok' tê binav kirin.

## Dîrok

Lêkolînên ku li ser xaka Entabê hatine kirin, nîşandane ku li vê deverê jiyana civakî, hê di dema kevn a paleolitik de destpêkiriye. Berî zayînê di nava salên 2000 û 1460'an de li Başûrê Rojavayê Kurdistanê, yanê li Dîlok û li derûdorê, bajardewlet hebûn. Ev dewlet di karên derve de bi Împaratoriya Hîtîtî ve girêdayî bûn. Yek ji van dewletan Qargamîş bû, ku di nav tixûbên Entabê daye. Piştî ku Hîtîtî li heremê belavdibin, b.z heta salên 539'an axa Dîlokê dikeve destê wan. Di demên dawîn de bi dorê; Artêşa Pers û a Îskender Mezopotamyayê û Dîlokê dagir dikin. Navça Belqîs, yanê Nizîp di van deman de ji bo şaristaniyên Selokîdî û Kommagene dibe nawendên çandî û siyasî. Piştî zayînê heta salên 400'î desthilatiya Romayiyan, heta 628'an jî a Sasaniyan li Entabê hukum dajon. Herem heta di sala 1516an de dikeve destê Osmaniyan, bi dorê di nav; Ereb, Xaçî, Eyûbî, Selçûqî, İlhanî, Memlûkî û Moxolan de dest guhertiye.

Bajarê Entabê di bîranînên gerokan de jî cîh digre. Wek mînak Evliya Çelebî ku di sala 1671'an de li Entabê digere, vî bajarî wiha liqelem dide 'Bajarê Eyintab bi temamî ji 32 taxî pêk hatiye. Li bajêr 8 hezar û 67 xaniyên xwelî ku wek qesran bilindin û bi kirêcê hatine spîkirin hene. 40 cûre trî, bi hezaran devkul dims, şîraniyên bi fistiq, sucûx û bastêq û meşlûrê Eyntabê, ji Ereb heta Ecem, ji wir heta Hindistan diçe. Xulasa ji bo mirov têr behsa vî bajarî bike, ne pênûs têr dike, ne jî ziman.'

Piştî desthilatiya Osmaniyan, herem bi Eyaleta Helebê ve hat girêdan û di sala 1839'an de ji alî Mihemed Elî Paşa yê Misrî ve hat dagirkirin. Piştî ku cardin ket destê Osmaniyan di sala 1914'an de wek sencexeke serbixwe hat birêvebirin. Di sala 1918'an de ku Dewleta Osmanî di Şerê Cîhanê ê Yekem de têk çû, pêşiyê ji alî Îngilîzan, paşê ji alî Fransiyan ve hat dagirkirin. Piştî vê bûyerê heta sala 1921'an gelê Entabê di serokatiya Qereyilan û Şahîn Beg de, li dijî Artêşa frensî şer kir. Li bajêr û navçeyan pevçûnên xedar derketin û di encam de leşkerên Fransî mecbûr man ku ji Entabê vekişin. Lê di vê pêvajoyê de ku Kemalîstan li Enqerê hukûmetek û artêşek damezirandibûn, di 20ê cotmeha 1921'an de bi Fransiyan peymana valakirina Entabê morkirin û bajar ket destê hêzên Komara Tirk.

## Kele

Kela Entabê, li Kurdistanê mînakeke ku li ser xwe maye. Bi heybet û bi dîroka xwe ya sirrî bal dikşîne. Bingeha kelê di dema Romayiyan de wek bircekî çavderiyê hatibe avêtin jî, di demên dawîn de hatiye firehkirin. Împaratorê Bîzansê Justinus jî, di sedsala 6an de kela Dîlokê bi şeklê îro avakiriye. Pîlana kelê wek daîreyeke gilover e. Dîwarên kelê ji kevirên mezin hatine rîsandin û ji alî 12 bircan ve hatiye zexmkirin. Bircekî kelê berheme dema Romayiya ye. Bircên rojavayê kelê jî ji dema Memlûkiyan maye. Di kelê de gelek rêçên avahiyên kevn hatine dîtin û restorasyona kelê hîn didome.

## Muzeya Yasemek

Bajarê Entabê ji ber ku ji gelek şaristaniyan re xwedî malîtî kiriye, devereke dîrokî ye. Li erdnîgara Dîlokê gelek muzeyen servekirî hene. Yek ji van muzeyên servekirî Yasemek e. Muzeya Yasemek 23 km dûrî Navça İslahiyê ye. Navê vê deverê wek 'Ocaxa Keviran' an jî 'Atolya Peykeran' jî derbas dibe. Axa derûdorê ji kevirên bazalt, ji rengê gewrê rengbinevş pêk tê. Ev kevirê biqalîte, gelek hişke û çavîkên hûr lê ne.

Muzeya Yasemek cara yekem di sala 1890'an de, ji alî arkeolog Felix von Luschan ve hat keşfkirin. Li heremê xebatên kolan û lêkolînên sîstematîk di sala 1958 û 1961an de ji alî heyeta ku di serokatiya Prof. Bahadır Alkım da bû, hat çêkirin û di van xebatan de 200 peyker ji bin axê hatin derxistin. Di salên dawîn de jî, xebatên kolanê berdewam kiriye û 300 peyker û neqşên kevirîn hatine derxistin û pakijkirin. Piştî van xebatan derûdora Yasemekê hatiye tekûzkirin û wek muzeyekî hatiye rastkirin.

Li gor lêkolînan, ev atolya peykeran di dema Hîtîtiyan de, berî zayînê di salên 1375 û 1335'an de ji alî qral Supilûma ve hatiye vekirin. Di avakirina deverê de, gelê heremê hatiye xebitandin. Piştî ku Împaratoriya Hîtîti xerabû û li Kurdistanê qraliyetên biçûk avabûn li herema Dîlokê jî, b.z di salên 9 % de, bi navê Samal qraliyetek hat damezirandin û atolya peykeran dîsa ket faaliyetê. Di peykerên deverê de bandora Asûrî, Hîtîtî û Sûriyan û di demê dawîn de ji bandora Aramiyan tê dîtin. Ev devera ku rêçên gelek şaristanî û dewletan dihewîne, b.z di sedsala 8an de dikeve destê Asûriyan. Piştî desthilatiya Asûriyan ocaxa kevir û atolya peykeran jî hatiye girtin û xebatkarên vê deverê koç kirine. Peykerên Yasemekê bi hakîmiyeta Asûriyan ve ketiye xwewneke kûr û heta sala 1890an di bin axê de mane.

Ocaxa kevir li ser 100 km² cîh girtiye. Teknîka kevir derxistin û peyker çêkirina wê demê gelek balkêş e. Pêşiyê derûdora kevirê bazalt, ê ku te derxistin, bi balyoz û çakûçan tê rastkirin. Axa dora kevir tê pakijkirin. Di qeraxên bloqên ku tê jêkirin de, hin qul tên vekirin û darên ziva di wan de tên çikkirin, piştî ku ev dar tên şilkirin firehdibin û kevir diderizînin. Bazaltê ku ji kutleya mezin diqete, dibin atolya peykeran ku li quntarên çiya ye. Şeklên ku wê li ser bazalt bê neqşkirin, bi şablonan li ser kevir tê xêzkirin. Paşê di sê merhaleyan de kevir, tê rotûşkirin û peyker tê derxistin.

## Belqîs û berhemên dîrokî

Bermayiyên bajarê Belqîs, 10 km dûrî navçêyê, li gundê Belqîsê ye. Mîratên bajêr ji dema Roma ya Helenîstîk û Bîzansiyan maye. Belqîs ji çar bajêrê mezin ê Şaristaniya Kommagene ye ku ew dewlet berî zayînê di sedsala yekem de li xaka Kurdistanê hatibû sazkirin. Gelek peyker û neqşên ku ji vê bermayiyê hatine bidestxistin, li Muzexana Entabê tên teşîr kirin. Pirê van peykeran, ji qebran hatine derxistin û ew remza kesên ku di qebran de veşartîne. Mixabin gelek deverên herema Belqîs, di sala 2000an de tevî bermayiyên binaxê di bin bendava Bîrecûkê ma.

Li Belkîsê berhemekî giranbiha Willaya Romayiya ye. Li zemîna vê avahiya ku ji Romayiyekî dewlemend maye, taswîrê daweta Qral Dionisos hatiye neqşkirin. Di vê avahiyê de mozaîqên ku xwedî bihayeke hunerî ne hatine dîtin. Ev wîla jî tevî bermayiyên din ên Belkîsê di bin ava bendava Bîrecûkê de ma.

Mizgefta Elî Necar berhemeke Dîlokê ê kevn e. Li taxa Tebaxxanêye. Li gor Ewliya Çelebi ev mizgeft di sala 1376an de hatiye lêkirin û di sala 1816an de ji serî ve hatiye restorekirin. Pîlana avahiyê çargoşe ye. Minara qalind û silîndîrîk a nava mizgeftê li ser qaîdeyekî heştgoşe hatiye danîn.

## Sûka Entabê; Alemeke Çîrokan

Sûka Dîlokê di nav bajarên Kurdistanê de, a herî şên e. Dengê ku ji hesinkarên Entabî belavdibin, serê şeveqan bajêr radikin ser lingan. Çakûçên ku bi hezaran sale li ser orsê, hesinên sor dipelixînin wek enstrumanekî di jiyana Entabiyan de hîn jî deng ve didin.

Xerat jî di sûka Entabê dê hîn jî cîhekî taybetî digrin. Mehên havînê ji bo xeratan demên kar e. Cûrên daran di destên wan ê bi meharet de, ji gelek şeklan derbas dibin û heta nav malan diçin.

Yek ji berhemên darê destê xeratan, topacên destê zarokan e. Zarokên Entabê tevî qirnap û topacên xwe, kêfa zarokatiya xwe derdixin.

## Sifirvan

Sifirvanî qasî dîroka mirovahiyê kevn e. Li deverên din sifir tevî çînko tê bikaranîn. Taybetiya sifirvaniya Dîlokê ew e ku yek perçe tê hilberîn. Di berhemên sifir ê Entabê de ji bo perçeyên sifir bi hevre bê zeliqandin, lihêm an jî madenekî din nayê bikar anîn. Tiştên xemlê, pêdiwiyên mitbax û malan ê ji sifir, li Entabê bi rêbazên taybetî tên çêkirin. Rûyê berhemên sifir bi çakûç û qelemeke pola bi sebr tê neqşandin.

## Eba

Qumaşekî taybetî ê din ku li Dîlokê tê hilberîn eba ye. Eba ji mû û pirçên lawirên wek; deve, ga, hesp, mî û bizinan tê rîsandin. Ev kincê ku ji qumaşê taybetî tê çêkirin, mêr lixwedikin. Li jora eba ji bo serî û li kêlakan jî, ji bo milan dû kun tên vekirin. Ev kinc bê mile. Di demên kevn de, ji bo rengdayina vî qumaşî, qalîk û koka gûzê, pelê simaq û heylangozan û cûrên giyayan dihatin bikaranîn. Lê îro eba vê taybetiya xwe wendakiriye û bi boyaxên çêkirî, bi benikên polyester tên rengkirin. Berê motîv û rengên li ser ebayan, cîh û statûyên însanan a di nav civakê de jî keşfdikir. Dewlemendan ebayên hevreşîm û çûxe li xwe dikirin. Xizana jî ê bê motîv û erzan. Îro hîn jî li hin gundan hinek kes ebayan li xwe dikin. Piştî ku makîne û sanayî pêşket û dezgehên destan hêdî hêdî ji holê rabûn, hilberîna ebayan jî, ber bi dawiya xwe ve diçe. Li Dîlokê niha hosteyên ebayan gelek kêm bûne.

## Midbex


Midbexa Entabê, ne tenê li Kurdistanê, belkî jî li cîhanê yek ji mitbaxên herî dewlemend û bi tâm e. Di xwarinên Entabê de, goşt, zebze û şîranî seretayên bingehînin. Dîsa gelek cûrên baharat, avdonk û sos, van xwarinan dixemlînin. Kebab, kiftik, lehmecûn, kifta xaf, qatmer, beqlawa, mûska û bi dehan cûrên xwarinê...

Dû mînak ji midbexa Entabê: Şorbeşêrîn; Birinc di avê de tê kelandin û piştre bi dims (doşab) re hinek din tê kelandin û piştî hinek sardibe tê xwarin.



16 Tebax 2015

Bajarê Entabê ji ber ku ji gelek şaristaniyan re xwedî malîtî kiriye, devereke dîrokî ye. Li erdnîgara Dîlokê gelek muzeyen servekirî hene.







www.arsivakurd.org

# OHAL ji nû ve di rojevê de ye




**Kalê Badî**

Piştî qetliyama li Pirsûsê 32 ciwanan jiyana xwe jidestda Tirkiye û Bakûrê Kurdistanê ket nava ragêşî û pêvçûn şerekî dijwar. Herwiha li hemû bajaran careke din cenaze tên definkirin, hawar û alozî bilind dibe û tevî vê dîsa hin pêkhateyên salên 90'î rû didin. Şerê ku ji aliyê PKK û dewletê ve di asta pêvajoya çareseriyê ya herî bilind de hat destpêbûn, ji aliyê herdû aliyan ve gelek dewer hatine girtin û herêmên ewlehiyê hatine avakirin. Nêzikahiya herdû aliyan ku wek bi hêzbûna di pêvajoya aştiyê tê nirxandin careke din dibe sedema şewitandina daristanan, valakirina gundan û koçên nû.

Ev pêkateyên ku di salên 90'an de di rewacê de bûn û ji sedema wê bi hezaran gund hatin valakirin, niha dîsa di rojevê de ne. Bi vê mebestê li Kilîs, Agirî, Dêrsim, Şirnex, Îdir, Wan, Colemêrd û Qersê gellek qadên ku wek herêmên bi ewle yên taybet hatin ragihandin. Ev ragihandin di 5 Tebaxê de destpê kirin û wê heta 19'ê Tebaxê dom bikin.

## Ji bo parastinê valakirina herêman?

Herêmên bi ewle yên taybet ku di salên 90'an de bi hinceta ewlehiyê gellek caran hatibûn ragihandin û bûbûn sedema valakirin û têkbirina aboriya herêmên çeper ên Bakurê Kurdistanê, piştî jinûve despêkirina şerê li dij PKK'ê dîsa ketin meriyetê. Bi biryara Walîtiyên Kilîs, Agirî, Dêrsim, Colemerg û Qersê 14 herêmên stratejîk wek herêmên ewle yên taybet hatin ragihandin û ev herêm wek herêmên leşkerî ji çûnûhata sivîlan re hatin qedexekirin. Ev biryara ku wê ji 5'ê Tebaxê heta 19'ê Tebaxê bê pêkanîn, di serê şêniyên herêmê de gumanên xeternak der kirin. Kes û berpirsên dezgehên herêman diyar dikin ku armanca vê biryarê valakirina van herêman û ji holê rakirina binemaya aborî ye.

Walîtiyên van bajarên ku qadên wan herêmên bi ewle yên taybet hatine ragihandin di derbarê biryarê de daxuyandin ku ji ber çalakiyên rêxistinên terorî ku dibin sedemê têkçûna civakî, aborî û azadiya geştê ya hemwelatiyan wan vê biryarê stendiye. Walîtiyan her wiha ragihandin ku armanca vê biryarê ew e ku can û malên hemwelatiyan biparêzin, aramiya herêman pêkan bikin û gel û dewletê ji êrîşên terorîstan biparêzin û di çarçoveya mewzûata yasayên ku vê biryarê rewa dikin de wan van biryaran xistiye meriyetê.

## Gefên valakirina gundan

Her çiqas di daxuyaniyên walîtiyan de armanca vê biryarê wek parastina can û malên şêniyên van herêman bê destnîşankirin jî pratîkên vê biryarê bi wêneyekî din dertê pêşberî gel. Parlamentê Berê yê CHP'ê Huseyîn Aygun bi ser hesaba xwe ya Twitter'ê ragihand ku piştî vê biryarê leşker çûne gundê Qereçawuş ê Xozata navçeya Dêrsimê û ji gundiyan re gotine; "Gundê xwe vala bikin, eger hûn vala nekin, ji bûyerên ku wê bêne serê we em ne berpirsyar in." Aygun, ragihand ku gundiyan jî gotiye ku tu dereke me ku em biçinê tune ye û da zanîn ku di derbarê mijarê de wan serî li Dadgeha Birêvebir a Elezîzê daye û di serlêdanê da wan ji dadgehê re ragihandiye ku sedemê biryara herêmên leşkerî yên bi ewle wek çalakiyên rêxistinên terorî û bêparmayîna hemwelatiyan a ji mafên xwe yên civakî û aborî hatiye destnîşankirin, lê belê ev biryar bixwe van mafê hemwelatiyan ji hole radike û ji ber vê yekê wan doza rawestandina vê biryarê kirî ye.



**'Wê Dêrsim venegere 90'an'**

Fatih Mehmet Maçoğlu yê Şaredarê Pulura navçeya Dêrsimê ku piraniya qadên wê di çarçoveya vê biryarê de wek herêmên qedexe hatiye destnîşankirin ji BasNûçeyê re ragihand ku di van salên dawî de di warê tûrîzmê û debarkariyê de li herêma Pulurê pêşketinên mezin çêbûne, di warê aborî de herêm bi xwe ve hatiye û vê yekê şêniyên navçe û gundên wê rûgeş kirî ye. Maçoglûyê ku tekane şaredarê Partiya Komunîst a Tirkiye(TKP)'yê ye angaşt ku ewlehiya herêmê hacet e, lewre li herêmê tu bûyerên tûndiyê pêk nehatine û got: "Ev sedemê ku rayedarên dewletê ji bo çûnûhata sivîlan herêmê qedexe dikin bê bingeh in. Di van salên dawî de hem ji hundur û hem jî ji derveyê Tirkiyeyê bi hezaran tûrîst dihatin Dêrsimê û bi taybetî jî navçeya Pulurê. Her wiha; piştî pêvajoya çereseriyê destpê kir, ji ber rewş asan bû, gellek kesên ku ji van deran koç kiribûn dîsa vegeriyan herêmê û dest bi xwedîkirina ajalan û bi taybetî xwedîkirina mozan, çandiniyê û fêkîkariyê kirin." Maçoglû da zanîn ku ev biryara qedexekirina van herêman tirsa vegera salên 90'an der kirî ye, lê belê ew ê nehêlin ku salên 90'an paşve vegerin. Maçoglû, diyar kir ku ragihandina 14 herêmên ewlehiyê tê wateya Dêrsimê ji Dêrsimiyan paqijkirinê û da zanîn ku wê gelê Dêrsimê û Pulurê ji vê biryarê re bêdeng nemîne û wê nehêle ku Dêrsim bê valakirin. Mehmet Maçoğlu got ku di rojên pêş de wê bi hevkariya hemû kes û dezgehên ku di vê mijarê de xwe berpirsyar dibînin re li hember vê polîtîkayê çalakî û daxuyaniyan bikin û wê nehêlin ku Dêrsim vegere 90'an.

## Şêniyên zozanan direvin

Piştî stendina vê biryara herêmên leşkerî yên ewle, ji van herêman agahiyên ku ev herêm têne valakirin jî hatin. Hate ragihandin ku li Bazîdê, li gund û zozanên derdora Çiyayê Kir, ji bo di demeke nêz de vê herêmê vala bikin hemwelatî ji alî leşkeran ve hatine hişyarkirin û ji ber vê yekê gellek gundî û kesên ku ji bo debara xwe li van gund û zozanan dimînin reviyane navçeya Gihadînê. Hate ragihandin ku gellek şêniyên gundên Gurd, Qendîl, Stûrka, Kanîsipî û zozanên herêma Gihadînê ji bêçarî malên xwe bar kirine û ji vê herêmê reviyane. Di derbarê mijarê de hemwelatiyê bi navê Samed Tekyurek ê ku ji zozanê Çiyayê Kir reviyaye Gihadînê ragihand ku ji ber tirsa mirinê, li gel ku ne dema vegera ji zozanan e jî ew bi ziyaneke mezin a aborî razî bûne ku ji herêmê birevin. Tekyurek ragihand ku leşkeran gefan li wan xwariye ku heta 15 rojan herêmê vala bikin û ji ber vê yekê wan herêmê terikandiye.

## Herêmên qedexekirî û pêwendiya tirsa talana sirûştî

Weke tê zanîn, li Rojavayê Kurdistanê piştî ji alî hêzên kurd ve bi destxistina Grê Spî ku Kobanê û Cizîrê gihande hev, rayedarên dewleta Tirkiyeyê vê yekê ji bo Tirkiyeyê wek xeteriyeke mezin ragihandin û ji bo pêşî li gihandina Efrîn û Kobanê bigirin, hejmareke mezin a leşker û çekên giran, li ser sînorê navbera Kobanê û Efrînê bi cih kir. Hate zanîn ku 2 herêmên bajarê Kilîsê ku li ser sînorê Rojava dikeve jî di çarçoveya vê biryara herêmên ewle yên taybet de hatine qedexekirin. Ji bilî van herêman li Dêrsimê û navçeyên wê 14, li Colemergê 19, li Agiriyê herêmên Çiyayê Agirî û Çiyayê Kir û li Şernexê jî hin herêmên din ji çûnûhata sivîlan re hatine qedexekirin.

Di nav vê hengameya şer û pevçûnên ku di navbera PKK'ê û Dewleta Tirkiyeyê de despê kirin de xala herî balkêş jî bi şer û pevçûnan re li hin herêmên stratejîk destpêkirina şewitandina darista û zeviyên Bakurê Kurdistanê ye. Hevberdevkê Meclîsa Ekolojiyê ya Amedê ya Tevgera Ekolojiyê ya Mezopotamyayê Gultekin Aydeniz di hevpeyvîna xwe ya bi Rojnameya me BasNûçeyê re ya dû hefte berê de angaştibû ku ji bo veberhênanên sirûştî yên Bakurê Kurdistanê projeyên pir mezin ku dikarin erdnîgariya wê têk bibin jî hatine destpêkirin, bi vê mebestê gellek bendav têne avakirin, ji bo bêne bêkêrkirin da ku ji hin armancan re derfetdar bibin hin herêm taybet ji bo Santralên Enerjiya Hîdron(SEH) têne şiwitandin û ev pengava nû her çiqas ji bo ewlehiyê hatibe destpêkirin jî armanc ne tenê ewlehî, her wiha dabînkirina hemû cûre çavkaniyên ku enerjî jê têne peydakirin e jî.





**Evindar Tekin**

Jinên Kurdistanê:


# Çekan rawestînin zarokên me nekujin





Duysal Karataş


Bahar Dündar


G. Gümüşhan


Hatice Tünar


Serap Aldemir


Z. Özgökçe

Bi destpêka pêvçûn û şerê ku ji nûve di nevbera PKK û dewletê de rû da careke din metirsiya kuştinan li nava civakê belav dibe û pêşketinên siyasî û civakî di xeterê de ne. Herwiha ci gelek derdorên civakî jî banga rawestandina şer û destpêkirina diyalog û muzakereyan bilind dibe. Jin ên ku her tim di dema şer de mafên wan û jiyana wan herî zêde tê binpêkirin jî careke din bang li herdû aliyan dikin da kû şer bidin rawestandin. Xebatkar û çalakvanên jin ên sazî, partî û dezgehên jinan ên li Kurdistanê bi rêya BasNûçe'yê bang li PKK û dewletê dikin da ku herdû alî jî bê şert û merc destên xwe ji çekan bikêşin û zarokên wan nedin kuştin. Jinan herdû alî jî hişyar kirin da ku ew şer giraniya herî mezin li ser jiyana wan dike û divê bi lez muzekere bi beşdariya jinan bê destpêbûn.

## Özgökçe: Divê daxwazên kurdan bên radîkalizekirin

Li Bakurê Kurdistanê di 3'ê Cileya 2013'an de bi çûyîna şandeyeke siyasî li İmrali'yê pêvajoyeke nû destpê kir û bi daxuyaniya di Newroza heman salê de ku ji aliyê vê şandeyê hate dayîn ev pêvajo bi awayekî fermî û eşkere pêş ket. Herî dawî bi lihevkirina Dolmabahçe'yê jî ji raya giştî re hate ravekirin. Lê ji ber pirsgirêkên bê ewlebûnê yên her du aliyan û manevrayên siyasî pêvajo bi awayekî bi rêk û pêk nemeşiya. Hilbijartinên parlamentoyê, têketina hilbijartinê ya HDPyê wek partî, rewşa Rojava û pêşketina hêzên kurd, îddiayên li ser piştgiriya Tirkiye'yê bo DAIŞê, çêkirina qaleqol û bendavan ev pêvajo têk bir û xitimand. Piştî hilbijartinê jî ku HDP bi ser ket û projeya AKP'ê û Tayyip Erdoğan ya serokatiyê neçû serî ji hêla hikûmetê ve ji bo ku vê rewşa erênî û aştiyane xirab bibe û dîsa weke berê desthilatiya xwe xurt bikin şerekî dijwar û piralî dan destpêkirin.

Di warê vejiyandina pêvajoya çareseriyê de çalakvana Komeleya Jinan ya Wanê Zozan Özgökçe got ku di vê pêvajoyê de ya herî baş ev bû ku cenaze nedihatin Tirkiye'yê lê her tim dihatin Kurdistanê û şerê kurdan li Rojhilata Navîn didomiya û ji bo kurdan dîsa cenaze dihatin û dayîkên kurd dilorandin û tiştekî cidî ji bo kurdan neguherî. Özgökçe anî ziman ku Erdoğan li dijî kurdan şer daye destpêkirin û divê muzakere di biwareke din de bidome, divê xweseriya kurdan ava bibe, çarenûsa xwe bi destê xwe diyar bikin da ku ev dijminatî bidawî bibe. Özgökçe got ku divê êdî li ser maseya lihevkirinê daxwazên kurdan bi awayekî radîkal û xurt bên ziman û bên radîkalîzekirin, ji bilî van daxwazan êdî her tişt xapandin e. Zozan Özgökçe bale kişand ku ji bo vejiyandina pêvajoyê divê ew wek jin, raya giştî ya navneteweyî hayîdar bikin.

## Gülmay Gümüşhan: 'Berê jî cidiytek tune bû'

Seroka YAKA-KOOP'ê ya Şaxa Wanê Gülmay Gümüşhan li ser pêvajoya ku van demên dawîn derbeke mezin xwar nêrînên xwe parvekir û got ku ji salên 1990'î û vir de ên ku aştiyê herî zêde dixwazin jin bixwe ne lewre şer herî zêde bandorê li jin û zarokan dike, bi sedan jin û zarok ji ber zêrandinên şerî mexdûr dibin û jin ji ber vê yekê jî bi awayekî giştî dengê xwe bilind kirin. Gümüşhan got ku ji berê ve di pêvajoyê de dilsozî û ciddiyetek tune bû, weke ku her du alî jî ji bo hin hesab û planên xwe baş bidin rûniştandin bi taqtîkî nêzîkî hev dibin, lew re heke jidil bibûna gavên pêvajoyê ji raya giştî re zelal kiribana û saziyên sivîl ên serbixwe jî tevlî pêvajoyê kiribana. Gümüşhan got ku destkeftiya herî mezin a vê pêvajoyê ew e ku mirov nedihatine kuştin û çek rawestiyabûne. Gümüşhan li ser beşdarbûna jinan a pêvajoya aştiyê jî got ku jin li her bajarî her tim li ser piyan in, lê meriv nikare bibêje sazî û dezgehên femînîst ên jinan bi tevahî dengê xwe bilind kirine, bes beşeke ji wan daketine kolanan.

## Duysal Karataş: Divê nêzîkbûn însanî û wijdanî be

Sekretera Mafên Mirovan a Tevgera Azadî Duysal Karataş jî di derbarê meseleyê de da zanîn ku divê her du alî jî bi zimanekî nermtir û aştiyane nêzîkî hev bibin û divê agirbestek bê îlankirin û tecrîda li ser Imaraliyê ji holê bê rakirin. Karataş got ku kesayeta yekemîn di vê pêvajoyê de Abdullah Öcalan bixwe ye. Karataş li ser sekna jinan di vejiyandina aştiyê de anî ziman ku divê jin, zimanê aştiyane belav bikin, ên ku dimirin bes gerîla nîn in û daxwaz ev e ku ji tu alî kes nemire, nêzîkbûn divê însanî û wijdanî bibe. Her wiha Karataş got ku ên ku hev baş fahm bikin jin in, lewre heman êş û kulan dikişînin, bi taybetî deriyên jinên Kurdistanê ji rojava re bê vekirin û dan zanîn dê were kirpandin ku mexdûrên herî mezin di şer de dayîk in. Her wiha Karataş anî ziman ku divê muzakere dîsa bêne destpêkirin û domandin.

## Hatice Tünar: 'Divê gavên şênber bên avêtin'

Endama HAK-PAR'ê Hatice Tünar jî destnîşan kir ku berî her tiştî divê çek bên rawestandin da ku siyaset hîn sexlemtir were meşandin. Tünar anî ziman ku di bin siya çekan de axaftina li ser aştiyê ne pêkan e, piştî rawestandina çekan jî divê gavên ji berê xurttir bêne avêtin û divê baweriya raya giştî bê xurtkirin, lew re berê baweriya her kesî pir xurt bûye lê niha tev hatiye şikandin û bo vê jî divê gavên şênber bên avêtin, lewre axaftin êdi têrê nake. Herwiha Tünar got ku mexdûrên şer tim jin û zarok in, hewldana jinan jî di bin siya çekan de wê bi kêr neyê, gava jin dadikevin kolanan ji aliyê polêsan ve tên zêrandin, hawîrdora jinan hatiye dorpêçkirin. Tünar got ku bo rawestandina çekan divê jin, bi taybetî jî dayîk kom bibin û ji raya giştî re dengê xwe bilind bikin.

## Serap Aldemir: Divê helwesta Kurdistanî bê pêşxistin

Endama PAK'ê Serap Aldemir jî di derbarê pêvajoyê de anî ziman ku daxwaz û hewldan ev e ku pêvajoya çareseriyê cardin bê destpêkirin, her wiha divê hemû jinên kurd bi hev re tevbigerin û divê bi pêşxistina helwesta Kurdistanî ev pêvajo cardin bê destpêkirin û daxwaz û gavên şênber bên avêtin. Aldemîr bo ji nû ve destpêkirina aştiyê divê axaftin û hevdîtin bêne kirin, gerila jî leşker jî zarokên jinan in û jin naxwazin kes bimire, tu wateya vî şerî tuneye, birêxistinbûyîna jinan ne têr e, divê xurttir bibe û zimanê aştiyane belav bibe.

## Evin Bahar Dündar: Şer ji hêla derdorên tarî ve dan destpêkirin

Ji KDP-T'ê Evin Bahar Dündar jî li ser heman daxwazê gotinên xwe bi me re parvekir û anî ziman ku pêvaja çareseriyê bi xweşî destpê kiriye û li Bakurê Kurdistanê meyla kurdan a li ser HDP'ê xurt kiriye, bes ji hêla mantalîteyeke tarî ve çalakiyên provakatîf hatine kirin, li bajaran çalakiyên ku ne li gorî şêweya PKK'êne hatine kirin, dewletê operasyon zêde kirine û ev yek di serî de jinan û hemû kesan ditirsîne. Dündar bale kişand ku jin ne aliyekî şer in bes yek ji aliyên aştiyê ne û aştî bi destê jinan pêk tê, ji bo vê jî jinên kurd bi pêkhatina yekîtiya netewî dikarin raya giştî ya cîhanê hişyar bikin.

## Hayriye Aşçıoğlu: Beyî jinan pêvajo nameşe

Ji KAMER'a Amedê Hayriye Aşçıoğlu ji di derheqê mijarê de got ku pêvajoyeke ku jin tê de nîn in wê kêm bimîne, lewre şer, ji herkesî zehftir bandorê li jinan dike û divê bi zimanekî aştiyane her du alî nêzîkî hev bibin. Her wiha Aşçıoğlu got ku piştî pêvajoya çareseriyê daxwaza aştiyê xurt bûye û êdî dayîkên qurbaniyan nabêjin bila weten sax be, êdî daxwaza aştiyê tê ziman û ev zanîn hatiye astekê û pêvajoyeke ku bêyî jinan tim nîvco dimîne.

www.arsivakurd.org

Şengal

# Birîna bê derman du salî ye











Şükran Mızrap

Lîsa Deysem

Bi hilkefta yekemîn salvegera qirkirina Şengalê ku ji hêla DAIŞ'ê ve di 3 Tebaxa 2014'an de hatibû kirin û bi hezaran ezdî hatin kuştin, bi deh hezaran ji warê xwe koçkirin û dîsa bi hezaran jinên ezdî ji alî DAIŞ'ê ve dîl hatibûn girtin û hîn jî di derbarê aqûbeta wan de agahiyên rasteqîn nayêne zanin li Hewlêr, Silêmanî, Amedê û gellek deverên din ên Kurdistanê çalakî û merasîm hatin lidarxistin. Di van çalakî û merasîman de hate xwestin ku jinên ezdî ji dest DAIŞ'ê bêne rizgarkirin û Şengal bê azadkirin.

## Bila NY bûyerê wek qirkirinê bipejirîne

Di yekemin salvegera qirkirina ezdiyan ku ji alî ezdiyan ve wek qirkirina 73. tê binavkirin de li gellek bajarên kurdistanê çalakî û merasîmên bibîranînê têne lidarxistin. Di van çalakiyan de hate xwestin ku Şengal bê rizgarkirin û ev qirkirin ji alî Neteweyên Yekbûyî ve wek qirkirin bê naskirin. Di merasîma li Duhokê hate lidarxistin de hate gotin ku ji bo xelaskirina ezdiyên di destê DAIŞê de, hewldanên raya giştî ya cîhanê têr nake. Di bîranînê de berpirsên RHK'yê soz dan ku ew ê hewldana xwe bo xelaskirina kesên di destê DAIŞê de bidomînin. Serokê Rêvebiriya Herêma Kurdistanê (RHK) Mesûd Barzanî jî di merasimê de xîtabî gel kir û da zanîn ku ku ji bo azadkirina Şengalê amadekarî tên kirin, planeke berfireh hatiye amadekirin lê belê divê ew hinekî din jî li bendê bimînin da ku plan ji hev belav nebe. Barzani got: "DAIŞ namerdane êrîşê dike, lê em di êniyên şer de heyfa xwe bi merdane distînin û em ê bistînin jî. Bi hêviya Xwedê, di demeke nêz de em ê Şengalê bi temamî azad bikin." Barzani ji Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî daxwaz kir ku li gel qeyrana aborî ya mezin jî grîngiyeke mezin bide Şengalê û gelê ezdî û da zanîn ku ji bo Şengal bibe parêzgeh ew ê bikevin nav hewldanan. Barzanî her wiha ji ber alîkariya wan kirine ku wan karibûye rê li hemwelatiyên ezdî yên ku di çiyayê Şengalê de asê mane rizgar bikin sipasiya xwe pêşkêşî şervanên Rojava kir. Fermandarê Pêşmerge yê Şengalê Mahma Xelîl jî anî ziman ku aqûbeta 6000 ezdiyan hê jî nediyar e û van demên dawî de 11 gorên komî hatine dîtin. Her wiha Xelîl destnîşan kir ku DAIŞ ê ji 5000î zêdetir jin û zarokên ezdî rewandiye û heta niha tenê 1916 ji wan hatin rizgarkirin.

## Selma Irmak: Heta Kurdistan azad nebe wê xeterî bidome

Bi hilkefta yekemîn salvegera qirkirina ezdiyên Şengalêi li kampa êzdiyan a Amedê jî bi beşdariya Hevseroka Şaredariya Amedê Gültan Kışanak û Hevseroka DTK'ê û Wekîla HDP'ê ya Colemergê Selma Irmak, çalakiyek hat lidarxistin. Selma Irmak di axaftina xwe de got ku qirkirina li ser Şengalê hîn jî didome û heta xaka Kurdistanê û Şengal azad nebe, xetereyên bi vî rengî wê bidomin û wisa domand: "Şengal rûmeta hemû Kurdistanê ye. Em bang li hemû dinyayê dikin ku ezdî ne bi tenê ne. Hemû kurd li cem wan in. Heta ku statuya Şengalê bê pejirandin têkoşîna Şengalê wê bidome. Qirkirina Pirsûsê nikare kurdan bitirsîne. Bêdengiya cihanê ya li hemberî bûyerên ku tên jiyîn şerma cîhanê ye. Dîlên jin ên di destê DAIŞê de rûmeta kurdan in." Keçeke ezdî li ser navê hemû ezdiyan axivî û got ku qirkirina ezdiyan hêj didome û ên dijîn bi saya korîdora ji hêla hêzên YPGyê hatibû vekirin xelas bûn. Her wiha keça ezdî anî ziman ku daxwaza ezdiyan ev e ku DAIŞ bê sekinandin, jinên di destê DAIŞê de bên rizgarkirin û ev bûyer, ji hêla cîhanê ve wek "qirkirin" bê pênasekirin. Di çalakiyê de, jin û zarokên ezdî, kirasên sipî li xwe kirin û pankartên li ser wan "qirkirin" nivîsandî vekirin. Piştre jinên ezdî şanoyeke li ser kiryarên DAIŞê lîstin.

## 73. fermana ezdiyan

Gelê ezdî di dîrokê de gelek caran rastî êrîşan hatiye. Par piştî ku bajarê Mûsilê ji aliyê DAIŞ'ê ve hate dagirkirin, di 3'ê Tebaxê de DAIŞ'ê berê xwe da Şengalê û navenda bajar bi dest xist û ji ber vê karesatê nêzîkî 290 hezar êzdî koçî cihên din bûn û 50 hezarên wan jî weke qirkirinên berê xwe sipartibûn Çiyayê Sengalê. Bi saya korîdora ku ji hêla gerîlayên HPGyê ve, ji Çiyayê Sengalê ber bi Rojavayê Kurdistanê ve hatibû vekirin, bi sed hezaran ezdî rizgar bûn lê ji ber rewşa wan a nparast û bê rêxistinî, bi hezaran hatin kuştin, bi hazaran dîl hatin girtin û keç û jinên wan li bazarên koleyan hatin firotin. Digel operasyonên hewayî yên hêzên hevpeymanê, HPG, YPG, YBŞ û hêzên Pêşmergeyan di 17'ê Kanûna 2014an de dest bi operasyoneke berfireh kirin û di 21'ê Kanûnê de navenda Şengalê bi dest xistin. Aniha hin jî bi temamî nehatiye rizgarkirin û li hin tax û gundên Şengalê şer berdewam e.


## "Lîstikeke qirêj û piralî tê meşandin"

Berpirsiyara kampa Fidanlik a Amedê Şükran Mızrak di derbarê kampên ezdiyan de da zanîn ku li kampa Amedê aniha 2960 kes dijî, nêzîkî hezar kesî li Batmanê, du sed kes li Wêranşarê,çil kes li Midyadê, şêst kes li Nisêbînê, çar sed kes li Şirnexê, du sed û pêncî kes jî li Sêrtê li gundan dimînin û ev yên ku têkiliya HDP'ê bi wan re heye, ji bilî van li Midyadê hezar û pênsed û li Nisêbînê jî sê hezar û pênsed kes di kampên AFAD'ê de têne hewandin. Mızrak da zanîn ku di destpêkê de 32.000 kes derbasî Bakur bûne, gelek jê vegeriyane, pir hindik jî çûne Ewropa'yê û piraniya wan ên ku ji Başûr derketine berê xwe dane Bakûrê Kurdistanê li cem xizmên xwe niştecî bûne. Şukran Mızrak anî ziman ku li ser Kampa Amedê û hemû kampên koçberên êzdî hin derûdor dixwazin rewşeke awarte û aloz biafirînin da ku jiyana êzdiyan asayî nebe û li karesata bi serê wan de hatî nepirsin, ji ber van sedeman her tim hin derdor dixwazin li vê derê gengeşî ,fikar û pirsgirêkên ewlehiyê derxin. Mizrak bal kişand ku hin xizmên êzdiyan ku li Ewropayê dijîn, ji wan re gotine ku heke hûn werin ber deriyê sînor û çalakiyeke li dar bixin, ji Bulxarîstanê derbasî Elmanya'yê bibin û bi vê yekê êzdî ketine rê. Her wiha li kampê bawerî ev e ku di vê yekê de tiliyê îstîxbarata Tirkiye'yê û burokrasiya Bertîlxur ya Bulxaristanê heye, lewre berî çûyîna wan, Konsulxaneya Bulxaristanê li kampê geriyane û ew agahdar kirine û hin derûdorên olî yên ezdiyan, hatine kampê bi ezdiyan re axivîne. Her wiha Mızrak destnîşan kir ku ew pê hesiyane ku ji kampê hin kes gelek caran çûne qerekola nêzîkî kampê û li ser vê mijarê têkilî danîne û ev hemû nîşan didin daxwaza çûyîna Ewropa'yê ji bo ezdiyan ''daxwazeke masumane ye'' lê ji aliyê din ve jî komployeke piralî ye. Mizrak derbarê perwerdeya ku li kampê tê dayîn de jî da zanîn ku bi riya mamosteyên Kurdî-Der û Eğitim-Senê perwerdê tê dayîn, perwerde bi Kurdî û îngilîzî ye, her wiha mamosteyên ezdî perwerdeya olî û çandî jî didine zarokan, zimanê perwerdehiyê Kurdî ye û 380 xwendekar hene. Mizrak bale kişand ku kampên girêdayî Şaredariyên HDPyî tu alîkarî ji derûdorên navneteweyî nastînin û bes bi derfetên xwe ezdiyan xweyî dikin.




Science-fiction' a bi Kurdî:

# Du kes û yek mirov








Gabar Çiyan

Dema ez romanên Newaf Mîro dixwînim, ez pê re îro, bi jiyana modern, lê adet, tore û baweriya kevnare re dijîm. Romanên wî dibin alîkar ku, jiyanek modern, bêyî ji nijad, adet û baweriya kevnare, bav û kalan dûr bikevim, bijîm. Malbat û nasên xwe re jî bibim nimûne, rê vekim.

Zimanê Mîro têra xwe xurt e. Kur e, tevayê nazik û nazdariya zimanê Kurdî dide der. Mirov ne tenê berhema wî dixwîne, pê re Kurdiya xwe xurt û tekûztir dike. Li ser hêzbûna zimanê Kurdî û zargotinê dibe xwedî fikir. Girêdan û dewlemendiya zimên bi xweza, eşq, evîn, hesret, îxanet, mirovahî, neyartî û dostaniyê dide xuyanîkirin û bi zimanek edebî tabloyan dineqîşîne, mirov aşiqî Kurdî û edebiyata kurdî dike.

Balkêşiya çîrokên romanên Mîro, ne ji aksiyona wan, bêhtir, mijarên hildibijêrê tê. Awayê bêjiyê, ku hilma xwe ji dengbêjiyê girtiye, cihê niqaşê ye. Kontrola ser çîrokê, girêdana beşa bi hev û dîmenên rengîn mirov dibe cîhanek eksotîk, klasîk lê têra xwe jî nûjen.

Di romanê wî de bi kurdî hizirkirin esas e. Kaniya xwe, dewlemendiya zimanê Kurdî ye. Pêwîstiyê ji peyvên zimanên cînar nabîne û qalibên ji zimanê din yekser wergerandine Kurdî, dûr e. Bi kurdî li derûdor, mirov, ajel, bûyer, xweza û Cîhanê dinêre, bi kurdî şirove dike û dide nirxandin.

Romana wî a nû „Du kes û yek mirov" di nav weşanên DO de, li Stenbolê, di gulana 2014 an de belav bû. Çîroka wê, li bajarekî Almanya'yê dest pê dike. Lehengên çîrokê, Peter Schûltz û Qudbeddîn Yildiz li heman bajarî ne, ji ber êş û naxweşiyê rewş û siheta wan ne baş e. Peter doktor, Yildiz xwendevanê zanîngehê ye. Yildiz, ji ber nexweşiya mêjî tedawiyê dibîne û pêwîstiya xwe bi neqla mêjiyek nû heye. Dema Peter ji ber nexweşiya xwe pir dihêşe, lê giran dibe û dimre, mêjiyê wî neqlî Qudbeddîn dikin.

Malbata Yildiz ji hêla Serhedan bajarê Qersê ye. Kurd in, lê çanda turkî û polîtîka asîmîlê û têkiliyên ne tekûz, bandorek neyênî li malbatê kiriye. Yildiz, bi mêjiyê nû, ji malbata xwe re xerîb e. Dibe xerîbê çand û zimanê xwe. Mîna Almanekî tev digere û dihizire. Qonaxa xwe nasîn û adaptasyona bi çand û malbata wî, bi alîkariya pisporan dibe.

Bi xwenasînê, xwedî li çand û zimanê xwe derketin, dema gera li welêt, hezkirina cî û xelkê xwe li cem Yildiz, an bi navê xwe î nû „Nemir" zêde dibe. Kurdayetî, nakokiyên nav wî û endamê malbatê mezintir dike. Dema serdana welêt, nasîna dapîra xwe „Pîra Asê" bêhtir bi welat, adet û baweriya kevnare „Ezdîti"yê xwedî derdikeve. Pîra Asê, di dema fermana filehan de, mîna gelek Ezdiyan, malbata wê jî ketibû ber êrîşa arteşa Romê. Paşê bi kurdekî misilman re zewicî bû. Pîr bibû, lê bi adet û baweriya kevnare ve girêdayî bû. Çi kes û hêz nikarîbû, girêdana dilê wê, jê derîne.

Piştî vegera welêt, aşiqî keçka Ezdî Siltanê dibe. Bi heft dilan dil dikeviyê. Jê re vedike derdê xwe. Lê adet e, dema dêûbav ne Ezdî bin, zewaca keçka Ezdî bi kesên dinre nabe. Herdu li dilê xwe guhdarî dikin, li hîsên xwe û girêdana xwezayî bi baweriya kevnare re...

Newaf Mîro li ser ziman û mijara romana xwe de wiha dibê, „Guhertina mejî, ez bawerim ku di siberojê de guncav bibe. Lê mebesta min, ew e yek hêjî gellek meriv ji bê wersele, an parçeyê laş dimirin. Dudo meriv, ne tenê bi xwîna xwe, bi mejiyê xwe ji hin aliya ye, yan na. Ger bi xwînê be, weke tête zanîn xwîna gellek merivan li hev tê. Lê ew nayê wê wateyê ku ew ji heman çand û netewê ne. Meriv motor, yan jî kompîtorek bîolojîk e. Ya grîng ew e, ji bo min. Ger bi nîjadê bûya, niha nîvê rojhilata nêzîk û ya navîn jî Kurd bûna. Lê em dibînin, ku ne tenê welatê wan, mejiyê wan bi ola ereba û nijadperstiya tirka dager bûye. Sêyem, li cem êzîdiya nepejirandina meriva heye, weke mînak divê şik neyê ser meriv, ger were ew ji ola xwe derdikeve. Min ev kire mijar. Her weha êzîdiyên Serhedê, yên bi ber şapa roma reş ketin, kiriye mijar û dû mayîyên wan ketiye. Lewma jî Nemir ji her tiştî bêhtir li xwe gerîn e, yan li xwe veger e. Pirsa roman dikeve kîjan beşê, ez biryarê ji xwendevan re dihêlim."

Herwiha Mîro li ser bandora ezdatiyê ku bandora wê li ser berhemên wî zêde ye jî da zanîn ezdayetî dewlemendiya pêşiyên kurmancî axêva ye û wiha domkir, „Raste, ji bo min jiyan Doh, Îro û Sibe ye, yê di nîvê îro û sibe de, em in. Em pirên, di nîvê dayik û bav û zarokên xwe de, wûsa jî di nîvê serborî û siberoja xwe de ne. Çawa şitlek bê reh çênabe, wûsa jî di rojekê de mezin nabe, yê meriv mezin dike ew ezmûne. Lê xelkê me ji ezmûn û serboriya xwe bêpar û qut kirine. Heta ji dîroka xwe bi xwe re kirine neyar. Weke yê sibe û êvarê rabe û kevira biavêja ji pêşiyên xwe de. Ola kê çi dibe bila be, qet nexem e, û ne çewtiye. Dewlemendî ye. Lê dewlemendî ji gellekî pêk tê, ger ji gellekî hinek were avêtin û wenda kirin, ew ê hêdî hêdî bibe hinek. Êzîdayetî dewlemendiya pêşîyên kurmancî axêva ye. Weke mîsal binavkirina „Xwedê", hinekî bi êzdîdiyeziyê ve tête girêdan. Çenko; êzîdî dibêjin, Tu Xwedaye, te Ezda me, lê navê şîrîn her Xwedaye. Ew herdok navê Xwedê ne, weke hezar û yek navî. Lê ji ber qedexe û çewisandina êzîdî bi xwe êdî êzîditîya xwe baş nasnakin. Lewma ez dixwazim, bi çavekî din weke Newaf Mîro li dunyayê û dîroka xwe binerim û ji rengekî ji rengan, bi siberojê û wêjeyê ve bihûnim"

Mîro, di romana xwe ya bi navê "Du kes yek mirov de", tore û adetên kevnare hinekî ne yekser be jî, rexne dike, ji ber ku rê li ber zewaca Nemir û Sultanê digre. Mîro dîtina xwe ya weke daxwaziya reformê di baweriyên kevnare wiha ravakir, „Hemû ol û nêrîna xwe di rewşa rewa û asayî de, ji nûve rêk û pêk kirine. Ez naxwazim bêjim "reform" çenko xelk ji reforman ditirsin. Lê jiyan bi xwe guherandin û veguherandin e. Yê xwe li gorî şertê jiyanê ne guherîne, jiyan û pergal wan vediguherîn e. Raste, we dest da ser pirseke grîng. Êzîdî, di rewşeke awerte û aloz de jiyane, û hêjî dijîn. Lewma êzîdiya derfetê xwe bilêv kirin, avakirin, pêşvexistin, nûkirinê nedîtine. Lewma çawa êzîdî dibêjin; em beriya Hewa û Adem hebûn, ev tê wê wateyê ku karê ji Hewa û Adem ve, were kirin û sererastkirin heye. Medeniyet, yan jî sivîlîzasyon di aştî û aramiyê de pêş dikeve. Her weha ciyê êzîdî lê dijîn û dijiyan têr av nedibûn û nabin. Lewma her cûre leystik û fen li ser serê wan hatiye pêkanîn. Êzîdiya xwe bi doxîna xwe parastin e. Ango nabe êzîdî bi yeke/î ne êzîdi re bi zewice. Ev ne pêkan bû. Weke tê zanîn, êzîdî di nîvê misilaman de dijiyan û dijîn. Ji xwe carekê qet di misilmantiyê de nabe yekî nebe misilman mehra wî were birrîn, û nayê pejirandin evd ji misilmantiyê derkeve. Vêca ka wê êzîdiyê hejar, çawa karibûna xwe di nîvê misilmana de bi parastina? Neçar bûn, bi doxîna xwe bi parêzin. Weke mîsal, gava qala evîna xortek ji Kurdên êzîdî bi keçek ji heman nijadê, lê misilman dihate kirin, pejirandina wê dijwar bû. Xetera talan û êrîşên mezin dihanî pê. Lewma bi raya min û bi qasî di salên dawî de bûye, divê êzîdîtî bi mejî were parastin û pêşvexistin. Lê ez ne oldar û ne jî alimê êzîditiyê me, ew raya Oldar û Civata Rûhanî ye.

Herwiha Mîro li ser xebatên xwe yên ku ew dixwaze di dahatuyê de bike û kitêbên li ber destê xwe de jî wiha got, „ Ez niha li ser romana Lehengê Dîl Keleşê Reş, dixebitim. Romaneke min ber bi xelasbûnê ve çûye. Ew Evîneke Platonîki ya ne jiyayî û yek alî radiweste. Lê evînek biçûk dilekî mezin, evîneke mezin dilekî biçûk di nava xwe de dilûsîne. Helbest jî didome, ger ez bidim ser hev dîwanek rehet heye. Her weka kurte çîrokê min jî hene..."

www.arsivakurd.org

## Xizan Şîlan

# Helbestên ku sirguniye dihonin

Zarathustra Çiyayî




Xizan Şîlan

Di warê wêje û hunerê de dibe tu gelekî din nebe ku wek kurdan li her deverên dinyayê belavbûnek hebe û tevî vê jî ji hev bê hay bin. Helbet bêhaybûna kurdan a ji hev sedema xwe ji gelek giraniyên siyasî û şer digirin. Tişta balkêş ew e ku çiqas koç û barkirin zêde bûbe, sirgunî û penaberî ewqas di helbest, stran û wêjeya kurdî de hatiye bi cîhbûn û estetîk û wêjeya kurdî giraniyeke mezin ji 'xemla' van xalan dide der. Ji çar parçeyên Kurdistanê bi heman hincetan kurdan berê xwe daye rojava û li wan deran keser û kelemên dilê xwe bi avayekî 'neçarî' ji stranan re, ji helbest û romanan re gotine. An ew bo xwînêr, bînêr û guhdarvanan rava kirine. Yek ji van kesan jî ku bi hincetên ku behsa wan tê kirin Xizan Şîlan ji kurdên Anatoliya Navîn e ku ew der xeleqeke wenda ya civak û nivîsara kurdî ye.

Şîlan piştî ku diçe sirguniyê tenêtî û keserkûriya xwe bi kurdî dike hempa û helbest bo wî dibe rêyeke berv bi roniyê ve. Lê belê di destpêkê de cûdakariya devokan, navbeynkariya di nava zimên de û bêhayiya kurdan a ji hev destê wî jî girê dide. Lê bi honandina helbestê ziman jî vedirise û helbest û ziman hevûdin mezin dikin.

Helbest çiye, nepirsin! Ew bi xwe, di rêzên kurt, kur û bi wate bersiva xwe didin. Kêliya eşqa yekalî birînan di laşê mirovî de vedike, melhem e, dikewîne. Ji sohbeta can bi cananê re, stranek evîndariyê ye. Dema tenêbûnê, yar e, dê û bav, dost e, mirov ji tariya reş û bîrên bê binî rizgar dike, derdixîne ronahiyê, bi hêvî û şîreta ronî û zindî dike. Wextê zilm û hovîtiyê, sînor nas nekir, kabûsên xewnên neyaran e. Carna çek û ber in, ji bêçaretiyê rizgar dikin. Gelek caran rûpelên dîrok, ziman, edebiyatê ne û çandekê ji nû ve vedijînin. Nepirsin helbest çiye, ew ê xwe bidin nasîn.

Xizan Şîlan ji Kurdê Anadoliya navîn, Încovê (Cihanbeyli) ye. Niha li Swêdê dijî. Ji çardeh saliya xwe ve helbestan dinîvîsî ne. Çar kitêbên wî, "Xem û xeyal", "Nameyek ji rinda min re", "Pejnên laşê mirî" û "Axîna singe qelişî" derketine. Xizan Şîlan hem di derbarê jiyan, sirgunî, hesreta welê û hem jî di derheqê helbest û hestên 'helbestî' de dilê xwe ji xwînêrên me re vekir.

**Di helbetsên te de, xurtiya zimên û tehma evînê derdikeve pêş. Tu ji kurdên Anadoliya Navînî, lê kurdiya te kûr e. Tu dikari qala têkiliya xwe û zimanê kurdî bikî?**

Belê, ez wisa dest bi bersivan bikim. Min di çardeh saliya xwe de dest bi nivisandina helbestan kiribû. Lê pir mixabin ku min bi tirkî dinivisandin, lewra zimanê kurdî qedexe bû. Zimanê perwerdehiyê bi tirkî bû. Kurmaciya min jî têrê nedikir ku ez bikaribim helbestên xwe bi kurdî binivisînim. Ez di bîst û du saliya xwe de derketim derveyî welat û hatim Almanya'yê. Li wir gelek hevalên min ku ji Kurdistanê hatibûn, hebûn. Bi kurmaciyeke sade, zelal û xweşik diaxifîn. Min carna ji sohbet û guftûgoyên wan hevalan zehmetî dikişand, hinek gotin fahm dikirin û hinek jî fahm nedikirin. Min bîryar da ku ez xwe fêrî kurdiyeke baş û geş bikim. Min di demeke kurt de HAWAR'a Mîr Celadet Elî Bedîrxan peyda kir û ew, çar caran xitim kir. Her wiha, bi zimanê kurdî gelek kovar, çîrok, pexşan, hêkaye û helbest xwendin. Êdî zimanê min hêdî hêdî bi pêş ve diçû, xurt dibû. Min li Almanyayê dest bi nivisandina helbestên kurdî kiribû. Piştî şeş salan ez vegeriyam welat. Sê salan li wir mam, ez dîsa derketim derveyî welat û hatim Swêd, li bajarê Stockholmê bi cîh bûm. Ez niha li welatê xerîbiyê, bi kefa destê giyanê xwe tovên kulîlka helbestên rengîn li ser mêrg û çîmenên sîngê laşê xwe parçe parçe direşînim û dipişkivînim.

**Çima di helbestên te de bêhtir evîndarî derdikeve pêş?**

Eşqa min sira sewdayake nependî ye, veşartî ye. Li şevistanên kor, bi rîsê teşiya sebira xwe evîna jankêş dirêsim. Di xewn û xeyalên perîşan de û mîna gerokê li çolistanan derbider bûyî li rinda xwe digerim. Bi salan e ku di westîbûna temenê xwe de, li tenêtiya kambax û li koretariya şevên xewle bi pozê pênûsê xwe yê zengarî helbestên ker û lal li ser dilbera xwe dinivisînim. Di xweşikiya bejn û bala rindekê de, di melûliya awirên dilberêkê de, di xweşsohbeta xezaleke lêvhingivî de kezeb û gurçik li min dihelin û ez sermest dibim. Dilê min yê rezîl her gav li nav agirê eşqa birîndar diperpite û dişewite.

Di helbestên min de ne tenê eşq heye. Êşa salên wêranbûyî, kul û keder, bêrîkirin, azadî, serhildan, felsefe, qêrîn û hawar, hesreta welat, feryad û fixana dayikan û bîranînên mişextbûyî jî bi peyvên tazî, bi hevokên tevizî û bi zimanekî lihevgeriyayî dihûnim û dixemilînim. Ez gelek caran li nav pêlên deryaya raman û hestên kûr avjeniyê dikim û coşa kaniya helbestên xwe ber bi keskesora aso ve diherikînim.

**"Axîna Sîngê Qelişî" li welat çapkirin û belav bû. Nêzîkbûna xwendevanan derbarê helbetsên te çawa bû?**

Belê, pirtûkên ku min li vir (Stockholm) çapkirinî kete destê xwendevanan, lê zêde belav nebûn. Pirtûka min ya bi navê "Axîna sîngê qelişî" li Stembolê ji aliyê weşanxaneya ARÊ ve çapbûyî, zêde li welat belav bû. Gihîşte destê xwendevanan.

Ez dikarim bêjim ku ji aliyê xwendevanan ve aleqeyek mezin ji helbestên min re heye. Ez di derbarê helbestên xwe de peyamên erênî werdigirim. Ev jî kêfxweşiyeke ji bo min...

**Helbestên te gelek tabloyên rengîn pêşkêşî xwendevanan dikin. Ez bawer im, çar kitêbên te yên helbestan belav bûne. Roman tune, bêhtir helbestan dinîvisî, Çima?**

Ji bilî helbestan tu xebateke min ya din nîne. Di navbera çar dîwarên zîndana odeya xwe de, bi saya neynokên xweşbînî û sebira derwêşên çolûbeyaran, ji bo pêşerojê hêviyan dikolim û perdeya sînorên rûreşiyê vediçirînim. Ez di neynika helbestan de li xwe digerim, li xwe vedigerim, xwe dibînim û bi pêpelokên giyanê xwe ber bi asta fezîletê ve hildikişim. Ez her şev di hembêza bêxewiya jana mirinê de bi ferişteyên dojehê yên serxweş re direqisim. Ez him bi ferişteyan re dans dikim, him jî di sergêjiya xwe de li dor helbestê semahê digerînim. Di semaha xwe de him helbestên kulek diafirînim û him jî di derûniya xwe de nefsbiçûkî, dilpakî û erdembûna xwe kifş dikim. Sifreya xweşbînî, dilovanî, hezkirin, şadî, bextewarî, hurmet û rûmetê li ber herkesî radixim û bi xwendevanên xwe re parve dikim.